Selcan, Zilfi, *Qese u Qesê Virênu Leksikon*, Dersim 2013.

Tigrîs, Amed, *6762 Gotinên Peşîyan*, Weşanên Rewşen, Stockholm 2001.

Tokmak, A. Naci, *Farsça-Türkçe Ortak Deyimler Sözlüğü*, İstanbul 1995.

Veroj, Said: <http://www.kovarabir.com/2012/10/seid-veroj-vateye-verenan-ye-dimiliZazakî/>

Zûlfiqârî, Hesên, *Ferheng-ê Bozorg-ê Zêrbu'l-Meşelhâ-yê Fârsî*, I-II, Tahran 1388 hş.

_____, *Dâstânê-yi Emsâl*, İntişârât-i Mâzyâr, Tahran 1385 hş.

<http://mawdoo3.com>

<https://forum.sedty.com/t349433.html>

A: Arapça

c: cilt

F: Farsça

Hş.: Hicrî şemsî

K: Kurmancî

s.: sayfa

T: Türkçe

Z: Zazakî

vd.: ve devamı



'EQÎDEYÊN MENZÛM DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Poetic Aqaidnames In Classical Kurdish Literature

Klasik Kürd Edebiyatında Manzum Akaidler

Nusrettin BOLELLÎ¹ - Nurettin ERTEKİN²

KURTE

Piştî qebûlkirina dînê Îslamê gelên Musulman ji bo bîr û baweriyên dînê Îslamê berhem afirandine. Gelê kurd jî, weke hemû gelên Musulman ji bo perwerdehiyâ bîr û baweriyên dînê Îslamê berhem anîne holê. Ev berhemên ku mijara wan bîr û baweriyên Îslamê ne û bi navê *'Eqâidê* tên nasîn hin ji wan bi pexş/nestr û hin ji wan jî bi nezm amade bûne.

Di edebiyata gelên rojhilatanavîn de çawa 'eqîdeyên menzûm wek cûreyek ji berhemên edebî hatine nasîn û di medreseyan de perwerdehî bi wan hatiye kirin her wiha edebiyata Kurdî jî ku perçeyek ji edebiyata rojhilata navîn e, ji berhemên edebî yên bi vî cûreyî bêpar nemaye û ji bo perwerdehiyê, xasma perwerdehiya zarokên Kurdan gelek 'eqîdeyên menzûm' di xwe de bi cih kiriye.

Ev nivîs armanc dike ku eqîdeyên menzûm ên di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine nivîsîn, bide nasîn. 'Eqîdeyên menzûm, hêjmara beş, beyt û taybetîyên wan bi qasî agahiyên ku me bi dest xistine di vê gotarê de bi cih bûne.

Bêjeyên Sereke: 'Eqîdeyên Menzûm, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, 'Eqîdeyên Menzûm ên Edebiyata Kurdî ya Klasîk.

1 Doç. Dr., Mamosteyê Beşa 'Erebî, Zanîngeha Bîngolê.

2 Xwendekarê Lisansa Bilind a Bi Tez.

ÖZET

İslam dininin kabulünden sonra Müslüman halklar İslam inancı için kitaplar yazmışlar. Kürd halkı da bütün müslüman halklar gibi İslam inanç esasları için kitaplar meydana getirmişler. Konusu İslam inancı ve esasları olan kitaplar 'Akaid' kitapları olarak tanınmakta, bunlardan bazıları manzum bazıları da düz yazı şeklinde hazırlanmışlardır.

Nasıl ki Ortadoğu halklarının edebiyatında manzum akideler bir edebi kitap türü olarak tanınmış ve medreselerde kitap bir eğitim ya da öğretim materyali olmuşsa, aynı şekilde ortadoğu edebiyatının bir parçası olan kürd edebiyatı da bu edebî türden kendini mahrum bırakmamış, özellikle kürd çocuklarının eğitimi için birçok manzum akaid kitaplarını kendi içinde barındırmıştır.

Bu yazıda elde ettiğimiz bilgiler çerçevesinde manzum akaidler, bölüm sayıları, beyit sayıları ve özelliklerine göre sınıflandırılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Manzum Akaidler, Klasik Kürd Edebiyatı, Klasik Kürd Edebiyatında Manzum Akaidler.

ABSTRACT

After accepting the Islamic religion, Muslim peoples wrote books for Islamic beliefs. The Kurdish people, like all Muslim peoples, have brought books for Islamic beliefs. The books on Islamic belief and principles are known as 'Akaid' books, some of which are poetry and others are written in plain text.

In the same way, Kurdish literature, which is a part of Middle Eastern literature, has not deprived itself of this type of literary book, and has been able to publish many verse akaid books for its education and especially for the education of Kurdish children, as it is known as a kind of literary book in the literature of the peoples of the Middle East, harbored.

In this article, poetical poets in classical Kurdish literature are introduced. In this article, we have covered the information on the vernacular akaideler, chapter numbers, couplet numbers and properties.

Keywords: Manzum Akaidler, Classical Kurdish Literature, Manzum Akaidler in Classical Kurdish Literature.

DESTPÊK

Bêjeya 'Eqâidê ji 'erebî hatiye û ji rayeka **a k d** (عقد) ê peydabûye. 'Eqâid, pirhejmara " 'Eqîde"yê ye û wateya wê a bêjeyî girêklêxistin' e. Bêjeya 'Îtûqad'ê bi wateya 'girêdana tiştêkî bi girêklêxistinê, baweriya tiştêkî bi dil û can, bi dil hebandin'ê tê.³

3 Ahmet Saim Kılavuz, "Akâid", DİA, II, 212.1989

Li gorî wateya têginî;

a- Rêgezên ku pêwîst e baweriya bi wan hebe

b- Zanistên ku mijara wan rêgezên baweriyên mecbûrî ne

c- Doktrînên baweriyê

d- Berhemên ku mijara wan rê û rêbazên baweriyê ne, ji wan re 'eqîde tê gotin.⁴

Bi wateya taybetî; zanista ku bi kurtasî û bê nîqaş mijarên bîr û baweriyên dinê Îslamê tîne zimên 'eqaîd e.⁵ Li gor vê pênaseyê mijarên 'eqaîdê yên sereke ev in.

a- Baweriya bi Xwedê

b- Baweriya bi firêşteya/ferîşteyan

c- Baweriya bi pirtûkan

d- Baweriya bi pêxemberan

e- Baweriya bi axretê

f- Baweriya bi qederê⁶

Nivîsandina berhemên 'eqaîdê di lîteratura Îslamê de cihêkî girîng digre. Ji ber sedemên derketina hin pisgirêkên bîr û baweriyê, zanyarên Îslamê berhemên 'eqaîdê nivîsandine. Di dîroka îslamê de cara yekem Ebû Henîfe berhemên 'eqaîdê nivîsandiye. *El-Fiqhu'l-ekber*, *el-Fiqhu'l-ebsat*, *el-Âlim ve'l-muteallim* û *el-Wasiyye* çar berhemên Ebû Henîfe ne di mijara 'eqîdê de. Wek Ebû Henîfe; 'alim û zanayên mîna Îmam Şâfi'î, Ahmed b. Hanbel, Taberî, Tahawî, Buhârî, Dârimî, Ebû Davud û Îbn Mende ji berhemên 'eqaîdê nivîsandîne.⁷

'Alimên Îslamê mijarên zanista 'eqîdî ewqas girîng dîtine ku ji bo jin û pîrekên musulmanan berhemên taybet nivîsandine. *El-Însaffî ma Yecîbû Î'tîqaduhû we la Yecûzu'l-Cehlû Bihî* ya Baqillanî (m. 1013), *el-Eqîdetu'l-burhanîyye* a Selalîcî (m. 1197), *el-Mufîde* ya Senûsî (m. 1490), *Eqîdetu Ehl'l-Îman* ya Ebdulqadir el-Fasî (m. 1680) wek nimûne ji berhemên 'eqaîdê ne ku bi taybet ji bo jina hatine nivîsandin, em karin destnîşan bikin.⁸

Nivîsandina berhemên menzûm çawa ku di warê fiqh, hedîs, sîyer, serf û nehwe de tîne dîtî, di mijarê 'eqîdeyê de jî xwe nîşan didin. Çend sedemên nivîsandina berhemên 'aqîdeyên menzûm ev in : Bi kurtasî û bê nîqaş rave-

4 Kadî Yildirim, *Ehmedê Xanî Külliyyatı II*, 'eqîdeya Îmanê, Avesta, r.42, İstanbûl, 2008

5 Kılavuz, hb. r.213

6 Kadî Yildirim, hb. r.42

7 Songül Karaca, Kadîzâde Mehmed Efendi, *Manzûme-i Akâid*, (inceleme-tenkitli metin- sözlük-dizin), Yüksek Lisans Tezi, Recep Tayyip Erdoğan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, 2012, r.3

8 Ahmet Çelik, *İnanç Eğitimi Açısından Mağrib'te Kadınlara Yönelik Yazılan Akîde Eserleri*, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h. 43, Erzurum 2015, rr. 442-446.

kirina mijarê, asankirina perwerdehiyê, ezberkirin û di hiş de mayîn û ji bo fêrbûna kesên ku bi ‘erebî nizanin, bûye sedema nivîsandina berhemên ‘eqîdeyên menzûm. Helbestvaniya nivîskar, tradisyona avakirina berhemên menzûm û komkirina hemû nêrînên mezhebekî di berhemê de jî, bûye hin sedemên din ji bo avakirina ‘eqîdeyên menzûm.⁹

Di nav de çend rîzperr/istîsna hebin jî bi gelemberî ‘eqîdeyên menzûm bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsandin û wek cûreyeke berhemên edebî di nav edebiyata rojhilata navîn de gelek nimûne jê dikare bê dîtin.

Taybetmendiyên ‘eqîdeyên menzûm bi vî şeklî em dikarin dest nîşan bikin.

- Bi gelemperî bi teşeya mesnewî hatine nivîsandin.

- Li ser wezna ‘erûzê ava bûne.

- Ziman asan e.

- Ji bo perwerdehiya xwendekarê medreseyan hatine nivîsandin

- Bi giştî ji bo ‘eqîda Ehlê Sunnet wel-Cemaet ava bûne.

- Ji ber ku mijarên ‘eqîdeyê ne , ‘ezabê gorê, bihişt, dojah, qîyamet jî tê de hatine ravekirin.¹⁰

1- DÎ EDEBİYATA ‘EREBAN DE ‘EQÎDEYÊN MENZÛM

Di edebiyata ‘Ereban da yekem car menzûmeyên didaktîk di dewra Emewîyan de, di warê fiqh, hedîs û tefsîrê de tê dîtin û hinek guherînên biçûk çê bûbin jî ev tradisyona menzûmeyên didaktîk di dewra ‘Abbasîyan de jî didome. Di dewra Abbasiyan de şairekî bi navê Ebân b. Abdilhâmid el-Lâhikî di van mijaran de gelek berhem anîye holê û wek pêşengê menzûmeyên didaktîk tê nasîn. Bi navê *Rojî û Zekâtê* menzûmeyerê wî heye.¹¹

Di edebiyata ‘Ereban de ‘eqîdeyên îmanê wek beşê binî ji edebiyata didaktîk cih girtiye, gelek berhem derketine pêş. Ji nav van berhemên a herî navdar *El-Emâlî* ya Êşî ye. Ev berhem ji 66 beytan pêkhatiye û di medreseyan de hatiye xwendin. 7 şerhê wê bi ‘Erebî û çar şerh û çar wergerê wê bi Tirkî hene.¹² Navên hin berhemên ‘eqîdeyên menzûm di edebiyata ‘Ereban de ev in.

- *Kasîde-i Nûniyye (Cevâhiru’l-Akâid)*- Hızır Bey- 105 beyt

- *‘Uqûdu’l-‘Aqâid fî Funûni’l-Fevâid*, İmâm-zâde Ruknuddîn Sedîduddîn

9 Ahmet Aydın, *Manzum Fıkıh Metinleri – I*, Usul İslam Araştırmaları, Sayı: 26, Temmuz-Aralık 2016, ISSN 1305-2632, s.137-147

10 Karaca, Songül, hb. r. 4-6

11 Ali İhsan Akçay, *Türk Edebiyatında Manzum Akâidnâmeler: İnceleme Metin*, Doktora Tezi, Uludağ Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam Tarihi ve Sanatları Ana Bilim Dalı, Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı, 2011, r.5-6

12 Karaca, hb. r. 6

- *Nazmu'l-Cevâhir*, Tâhir b. Arabşâh el-İsfahânî
- *Nazmu 'Aqâidi'l-Mardînî*, Alâaddîn Ebû'l-Hasan Ali b. Muhammed b. Ebî Bekr b. Şeref (el-Müşerref) el-Mardînî
- *El-'Aqîdetü's-Seffârîniyye*, Abdullah eş-Şemrânî- 210 beyt
- *'Aqîdetu's-Sarsarî*, Yahya b. Yusuf es-Sarsarî
- *Qesîda Emâlî*, Sirâceddîn Ali b. Osman el-Ûşî- 66 beyt
- *el-Îlâm bi-Hudûdi Qavâidi'l-İslâm*, Kâdi İyaz
- *Cevheretu't-Tevhîd*- Ebû İshaq İbrahim b. İbrahim el-Lekânî- 144 beyt
- *el-qasîdetu'n-Nûniyye*, İbn Qayyim el-Cevziyye-5949 beyt
- *el-'Aqîdetu's-Şeybâniyye*, Ebû Muhammed Yûnus b. Yûsuf eş Şeybânî-79 beyt
- *'Aqîdetu'l-Vâsitiyye*- İbn Teymiye
- *'Aqîdetu'l-Avâm*- Muhammed Alevî el-Malikî¹³
- *Envârü'l-Uqûl fi't-Tevhid*-Ali Bahâurrahman el-Mennân
- *'Aqîde-'Omer* b. Ebî'l-Hasen el-Hanbelî
- *Ed-Durretu's-Sittîniyye fi Telhîsi'l-'Aqîdeti's-Sunniyye*-Fahrüddîn b. ez-Zubeyr Ebû'l-'Aliyye

2- DÎ EDEBİYATA FARİSÎ DE 'EQÎDEYÊN MENZÛM

Li gor jêderê ber destan di edebiyata farsî de em li rastî du 'eqîdeyên menzûm tîn. Yek te'lîf e û yek wergera ji 'erebî ye.

- *Mîr'atu'l-'Eqâ'id*- Molla Camî - 226 beyt e¹⁴
- *Necm-i Zeberkân*- Wergera *Qesîda Emâlî*, Sirâceddîn Ali b. Osman el-Ûşî ye¹⁵

3- DÎ EDEBİYATA TIRKÎ DE 'EQÎDEYÊN MENZÛM

Di edebiyata tirkî de hîn bêtir di sedsala 17 û 18an de em li rastî 'eqîdeyên menzûm tîn. Di vî warî de heta dema me gelek berhem hatine nivîsandin. Di edebiyata tirkî de 'eqîdeyên ku hatine nivîsandin wek du cûreyan em dikarin binirxînin. 'Eqîdeyên werger û 'eqîdeyên te'lîf.¹⁶

3.1- 'Eqîdeyên werger;

- *Fıkh-ı Ekber*- İmâm-ı Azâm
- *el-Vasiyye*- İmâm-ı Azâm

13 Akçay, hb. r. 6-10

14 Ahmet Sevgi, *Molla Câmî'nin Akâit Risalesi ve Türkçe Manzûm Bir Tercümesi*, Selçuk Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi Dergisi, Yıl 2011, Sayı 26, s.1-4

15 Karaca, hb. r.8

16 Karaca, hb. r.10

- *Kasîde-i Emâlî*- el-Ûşî
- *Kasîde-i Nûniye*- Hızır Bey
- *Îtikadnâme*- Molla Câmî
- *Vasiyetnâme*- Birgivî¹⁷

3.2- ‘Eqîdeyên te’lîf;

- *Ahvâl-i Kuyâmet*- Şeyyad Hamza-289 beyt e
- *Sîrâcu’l-Müslimîn*- Ali Şîr Nevâyî-213 beyt e
- *Manzûme-i Akâid*- Kadızâde Mehmed Efendi-1528 beyt e
- *Hudâ Rabbim Manzûmesi*- Erzurumlu İbrâhim Hakkı
- *Nazmu’l-Leâlî*- Tokatlı İshak Zencânî-302 beyt e
- *Manzûme-i-Akâid*- Kadı Hüseyin Ispartavî-2037 beyt e
- *Zuhrül-Âhire*- Süleyman Nahîfî-756 beyt e
- *Kasîde-i Îtikâdiyye*- Kemâl bin el-Hâc Mehmed Salih Vecîhî Paşa-215 beyt e
- *Türkçe Îtikad Manzûmesi*- Veled Çelebi İzbudak-102 bend e
- *Ravzatu’l-Îmân*- Yusuf el-Maraşî¹⁸

4- DÎ EDEBİYATA KURDÎ DE ‘EQÎDEYÊN MENZÛM

Edebiyata kurdî ya klasîk, wekî edebiyata ‘erebî, farsî, tirkî ya klasîk perçeyek jî edebiyata rojhilata navîn e. Di bin bandora edebiyata rojhilata navîn de maye û cureyên vê edebiyatê em di edebiyata kurdî ya klasîk de jî dibînin.

Şêx Ehmedê Xanî, bi nivîsandina berhema xweyî granbiha ya bi navê *‘Eqîdeya Îmanê*, bûye pêşengê ev cûre berhemên edebî di edebiyata kurdî ya klasîk de. ‘Eqîdeyên ku piştî ‘eqîdeya Şêx Ehmedê Xanî hatine nivîsandin; bi naverok, teşeya nezmê, bikaranîna qalibê ‘erûzê, asaniya ziman, dûrbûna ji pêkanîna hunerên edebî, di bin bandora vê ‘eqîde de mane. Ji bo îsbata van agahiyan ew ‘eqîdeyên ku em ê li jêr bidin nasîn ji me re bes in û pir in.

Li gor jêderên li ber destan bi devoka Goranî me tu agahî der barê ‘eqîdeyên menzûm nedîtin. Ku hebin jî em negihîştin wan.

Bi devoka Soranî em gihîştin du ‘eqîdeyên menzûm. *‘Eqîdeya Mewlewî* a bi navê *‘Eqîdey Merdiyye*, bi danîşanên/ delîl ‘eqlî û neqlî, bi ravekirina hemû mijarên bîr û bawerîyê ve ‘eqîdeyêke mezin û berfireh e.

Tevî ku edebiyateke nûjen e jî, bi nivîsandina 5 berhemên ‘eqîdeyên menzûm devoka Zazakî/Kirdkî jî, xwe bêpar nehiştiye ji vê cûreya edebî.

17 Akçay, hb. r. 6-16

18 Karaca, hb. r. 10-16

Bi devoka Kurmancî gelek ‘eqîdeyên menzûm hatine nivîsandin. Nivîsandina ‘eqîdeyên menzûm ji Şêx Ehmedê Xanî dest pê kiriye û heya roja me jî didome. ‘Eqîdeyên ku em gihîştin wan li gor jêderên li ber destan me der barê wan de agahî dest nîşan kir. ‘Eqîdeyên ku em negihîştin wan avê wan an navê nivîskarê wan di bin-binbeşekê de me nivîsand.

Her çiqas wek kêmasiyeke vê gotarê bê dîtî jî, ji ber ku em negihîştin jîyana temamê nivîskaran, bi sedema ku guncanî/ahenga nivîsê xera nebe me jîyana nivîskaran nenîvîsand.

4.1- ‘Eqîdeyên Soranî

4.1.1- Mehwî- ‘Iqdul ‘eqaîd (m.1830/1906)

Ji 136 beytan pêk hatiye. Bi teşeya *Mesnevîyê* hatiye nivîsandin. Bawerîya bi Xweda, bawerîya bi pêxemberan, îman û kufr, ‘eşereyê mubeşşere (Deh sehabiyên ku bi çûna bihiştê hatine mizgînkirin), tewbe mijarên vê ‘eqîdeyê ne. ‘Eqîda Mehwi, hemdem qesîdeyêke ‘nûnî’ ye. Hemû misrayên duwem bi herfa ‘n’ xelas dibin. Nivîseke bi vê terzê di nav ‘eqîdeyên ku li ber dest in nehatiye dîtî. Di vî warî de ‘eqîda yekem e. Herdû beytên pêşî û dawî ev in.

Mesûlîme î’ane le wehhabî muste’an

Her lew dekem sual û, dekem hemdî ew be can

...

Baqî le fezlê xwotewe ser rohî ehmedî

Nazil bikey selat û selamî leh ed fuzûn¹⁹

4.1.2- Mewlewî-‘Eqîdey Merdiyê (m.1806/1882)

‘Eqîdeyê gelekî mezin e. Di edebiyata kurdî de ‘eqîdeya herî mezin e. Ji 2441 beytan pêkhatiye. Destpêk, mebhesu’s-selatî we’s-selâm, mebhesu’l-îman, mebhesu’l- wucûdî wel wucûb, mebhesu’l-wehdetî, mebhesu’l-îmanî billahî te’ala, mebhesu’l-heyât, mebhesu’l-‘ilm, mebhesu’l-îradetî, mebhesu’l-qudretî, mebhesu’l-sem’î we’l- beserî we’l-kelam, mebhesu’l-beqaî we’t-tekwîn, mebhesu’l-esmaî, mebhesu’l-ef’alillahî we hîkmetîhî, mebhesu’l-husnî wel qubhî, mebhesî ruyetullahî te’ala, mebhesî wesfî’l-melaîketî, mebhesu’l-îmanî we’t-tesdîqî bî cem’îl kutûbî’s- semawiyetî, mebhesî fi tehqîqî kelâmillahî te’ala, mebhesu’l-enbiyaî we’r-rusûlî ‘eleyhîmu’s-selam, mebhesu’l-xatemiyyetî, mebhesu’l-îsrâ we’l-mî’racî’r-resûl, mebhesu’l-kerametî, mebhesu’l-xewariqî, mebhesî îmtîhani’l-ewlîya, mebhesu’l- xulefaî we’s-sehabetî, mebhesî yezîd, mebhesu’l-xîlafetî we’l-îmametî, mebhesu’l-hesenî wel huseyn rediyellahû te’âlâ ‘enhûma, mebhesu’l-eîmnetî fi’l-ûsûlî we’l-furû’ we’tterîqetî we eqtâbiha, mebhesî hedretî eş-şeyx

19 Mehwi, *Dîwanî Mehwi*, wêşanên Nefel, r. 120-132, Stockholm, 2007

‘usmân sîraceddîn we ewladîhî qeddesellahû esrârehum, mebhesu’l-îmanî bi’l-yewmî’l-axirî we ‘elameti’l-axîretî, mebhesu’l-munkerî we’nnekîrî, mebhesu’l-axîretî we’l-me’ad, mebhesu’l-hîsabî we’l-kîtabî we’ssîratî we’l-mîzân, mebhesu’l-cennetî we’nnâr, mebhêsî beqai’l-cennetî we’l-cehîmî, mebhesu’l-şefa’etî, mebhesu’l-qedâî we’l-qeder û xatîme navên beşên ‘eqîdeya Mewlewî ne.

Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Zubdey ‘eqîdey xulasey kelam

Her le tow û bo tos hemd û senay ‘am

...

Nîza’ berya we degel xas û ‘âm

Sehhel ‘eqîde we temel kelam²⁰

4.2- ‘Eqîdeyên Zazakî

Heta niha bi devoka zazakî pênc ‘eqîdeyên menzûm hatine peydakirin.

4.2.1- Şêx Muhemmedê Şêx Ensarî- Raro Raşt (m.1879/1976)

324 beyt e û bi teşeya mesnewî bi ‘erûzê hatiye nivîsandin. Behra wê Muteqarib e û qalibê wê jî *fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl* e. Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Heçî hemd hemey jîn Allah rî tamam

Resûl bê jê ser o selat û selam

...

We him mu’în û mu’înât ecme’în

Bidî xatirê Xatemu’l-murselîn

‘Eqîdeya *Raro Raşt* ji destpêkek û 21 beşan pêk hatiye. Navê beşên wê ev in: Erkanê îslamey, erkanê îmanî, sîfatê ullah heçî zatîyey jey, ino mebhês ê sîfatê selbîyew, sîfatê ullah heçî qedîmîyey ki subûtiyey, inca melaîketandê homay ra behs keno, inca kitabandê homay ra behs keno, inca ‘ededê enbîyandê homay ra behs keno, mebhês u’t-tefazul, sîfatê peygembera hemînî, inca ‘elamatê qiyamet ra behs keno, inca cuz’î îxtiyarey ra behs keno, mebhês u’r-rîsâle, mebhês ê şemaîlandê muhemmed sellallahû te’ala ‘eleyhî we selleme, inca mî’racdê peygemberî ra behs keno, inca ru’yetê cemaleyda ullah ra behs keno, inca te’sîrdê du’an a behs keno, mebhês ê nesbu’l-îmamî, inca sualdê qebri ra we ehwaldê qiyametî ra behs keno, mebhês ê adabdê nimajî, mebhês ê wardîşî.²¹

20 Mewlewî, -‘*Eqîdey Merdîyye*, lêkolînewe û lêkdanewe mela ‘Ebdulkerîm Muderris, pêndaçûnewe Fatih ‘Ebdulkerîm, muntedî îqres-seqafî, 1988.

21 Bilal Zilan, *Di Kitabê Muhemmedê Şêx Ensarî: “Raro Raşt” û “me’lûmatê Dînîye” (metn û cigêrayîş)*, Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanîstê Ziwan û Kulturê Kurdan, Tezê Lîsansê Berzî, r. 24-25, Mêrdîn, 2016

4.2.2- Mela Mehmed Elî Hunî- Eqîdey Îman-Eqîdey Îslam (m.1930)

66 beyt e. Bi teşeya Qesîdeyê û wezna heceyê hatiye nivîsandin. Îman, tewhîd, sîfatê Xweda, şeş ruknê îmanê û şîroveya wan, mijarên sereke ên vê 'eqîdeyê ne. Wek mînak hin beyt ji vê 'eqîdê;

*Hey ya însan ya însan
Homa yew bêya îman
Tu biwan 'ilm û îrfan
Bizan eqîdey îman*

...

*Vonû, Veynen', Virazen'
Eşkenû Şerr nêwazen'
Zanû, Eşnawen', Wazen'
Bizan eqîdey îman²²*

4.2.3- Mela Muhemmedê Hezanî- 'Eqîdetu'l-Îmanî (m,1939)

Bi şiklê mesnewîyê bi wezna 'erûzê, bi behra remela nesalim li ser qalibê *fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun* hatiye amade kirin û bi giştî 144 beyt e. Her çî qas ev menzûme bi navê 'Eqîdetu'l-Îmanî hatiye nasîn jî, lê belê 96 beytên pêşî 'eqîde ye û beytên mayîn fiqh e. Ruknê îslamê û ruknê îmanê, sîfatê Xweda, bawerîya bi pêxemberan û mi'rac wek mijar di vê menzûmeyê de bi cih bûne. Herdû beytên pêşî û dawî ji mijara 'eqîdeyê ev in;

*'Ewwilê destkerdişê eşyan tamam
Vatişê ma namê Ellah ze'l-meram*

...

*Qey 'eqîdî vatişê ma bîy xîtam
Şafi'ê ma ro bivarê se selam²³*

4.2.4- Ali Sizerî- Seruven-i Mahşeri (m.1950)

Mijarên girêdayî bi roja Qiyametê û heşrê di vê berhemê de tînen îzahkirin ku ev mijar jî, ji mijarên 'eqîdeyê tînen hesibandin. Bi tîpên latînî hatiye nivîsandin. Di 2007an de du cara di nav weşanên Şenol yayincılık de hatiye weşandin.

Bi wezna hecê bi teşeya mesnewî hatiye nivîsandin. Hejmara beytên wê 382 ne. **Her dû beytên pêşî ev in;**

*Bismillahî vaje hem dest pê'bike
Behsê merg û axrette ma go bike*

22 Zilan, hb, r.24-25

23 Zilan, hb, r.26-27

*Çiyko behs keno kîtab ma nûsenê
Behsê qiyamette ma dest pê'kenê²⁴*

4.2.5- Mela Mehemed Demîrtaş- Qesîdeya Diyîn (m.1936)

Di formata mesnewiyê de hatiye amade kirin. Mijarên ruknên îslamê, ruknên îmanê, tewhîd, helal, heram, zekât û wd. tê da bi cih bûne.

Malikên Pêşîn û Paşîn:

*Ma bi bîsmîllahî dest pey kenî her çî ra verî
Hemd û sena qey Ellah rî ma bî abd û rehberî*

*Ferzî ma nuştî vaji ma bizûni bîyari ca
Ma emelkî qey Ellah dî sahîh û, îmûnî ma²⁵*

4.3- 'Eqîdeyên Bi Devoka Kurmancî

Bi vê devokê gelek 'eqîde hatine nivîsandin. Em gihîştin hin 'eqîdeyan û me li jêrê danasîna wan kir. 'Eqîdeyên ku em negihîştin wan wek binbeşek vê gotarê me navê wan û navê nivîskarê wan bi bîr anîn. 'Eqîdeyin li ber dest jî ji ber ku nivîskar ne diyar e me di vê gotarê de ji wan behs nekir. Lewra tê famkirin gelek 'eqîde hîn nehatine tomarkirin.

4.3.1- Şêx Ehmedê Xanî- 'Eqîdeya Îmanê (m.1651/1707)

Bi teşeya mesnewî, bi wezna 'erûzê, bi behra muteqarib, bi qalibê *fe'ûlun, fe'ûlun, fe'ûlun* hatiye nivîsandin û ji 70 beytan pêk hatiye. Di edebiyata kurdî de li gor jêderên li ber destan 'eqîdeya yekem e. Di edebiyata kurdî de yekem berhema dînî ye. Bandora wê li ser 'eqîdeyên ku piştî wê hatine nivîsandin eşkere xwuya dike.²⁶ Herdû beytên pêşî û dawî ev in;

Li bate mûheqqeq bitin ev cewab

Duhû gote min hatifê bê hîcab²⁷

...

Mîn û cümle ê ummeta Mustefa

Bibî cennetê tabî'ê Mustefa²⁸

24 Zilan, hb, r.27-28

25 Metîn Çiftçî, *Edebîyatê Zazakî yê Klasîk de Eqîdenameyî*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015, r.117-119

26 Kadrî Yıldırım, h.b r. 42-43

27 Kadrî Yıldırım, h.b.r. 175

28 Kadrî Yıldırım, h.b.r. 333

4.3.2- Mela Xelîlê Sêrtî – *Nehcu’l-Enam* (m.1754/1843)

Nehcu’l-Enam bi teşeya mesnewî li ser behra muteqarib bi qalibê *fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûlun, fe’ûl* hatiye nivîsîn. Ji 274 beytan pêk tê. Mela Hilmî Qoxî ev berhem şerh kiriye. Ji Nehcu’l-Enamê em du malikan li jêr dinivîsîn.

*Tu guh dêre nutq û beyana fesîh,
Ji bo ferzû ‘eynane merdê melîh*

...

*Melaîk ji bo wî hene bê ‘eded,
Mudamî ‘îbadet dîkin bê meded²⁹*

4.3.3- Evdîrehîm Rehmîyê Hekkarî- ‘*Eqîda Kurdî* (m.1958)

Dînê me, şûrûtu’l-îman, amentû billahî, we melaîketîhî, we kûtûbîhî, we resûlîhî, sifati’r-resûl, ‘elametissa’etî, we’l-yewmi’l-axirî, Hedretî Mûhemmed ‘eleyhisselat û wesselam û tarîx 11 beşên vê berhemê ne. Mîjarên di vê berhemê de bi cih bûne ji navên beşan xwuya dibin. Bi giştî 74 beyt e û bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin.

Her dû beytên pêşî;

*Elhemdûlîllah dînê me Îslam e heqe em muminîn
Tabî‘ê şahê Emînîn ummeta Wî muslimîn*

*Ruknê dînê me ku pêncin tû bizane ey ‘ezîz
Ya ewel kelîma şehadet tû bibêje pak temîz*

Her dû beytên dawî;

*Tû bi xwûne wê ‘eqîdê hem tû berke wesselam
Ji ‘eqîdê Hemden Lillah gotî min temmel kelam
Ne ewwel û axir ku yêke sanî û salis ku sî
Qenc tefekkur ke bi zane bûye tarîxa ewî³⁰*

4.3.4- Mela Ehmed Heyderî- ‘*Eqîdeya Îmanê* (m.1887/1937)

Bi teşeya mesnewîyê bi wezna ‘erûzê li ser behra hezeca nesalim bi qalibê *mefa’îlun, mefa’îlun, fe’ûlun* ji çar beşan pêk hatiye. Navên beşan ev in. Destpêk, ruknên îslamê, ruknên îmanê û xetîme. ‘Eqîde bi giştî 225 beyt e.

29 Ahmed Hilmî Qoxî, *Rehberê ‘Ewam Şerha Nehcu’l-Enam*, Îhsan Yayınları, İstanbul, 2004

30 Tehsîn Îbrahîm Doskî, ‘*Eqîdenameyên Kurmancî*, Çapxaney Hecî Haşim, r. 19, 26, Hewlêr, 2010

Beyta destpêkê wiha ye:

*Ji ewwel hemdê bêhed bo Xuda bit
Selamu-llah li ruhê Mustefa bit*

Beyta dawîn ji wiha ye:

*Ji bona Heyderî Ehmedê bedkar
Bixwînin fatîhek îclasê sê car*

4.3.5- Mela Mihemmed Emîn Heyderî - ‘Eqîda Îmanê (m.1927/2003)

Ev ‘eqîde ji heşt beşan pêkhatiye. Destpêk 12 beyt, behsa bawriya bi xwedê te‘ala 8 beyt, behsa baweriya bi melaîketê xwedê te‘ala 9 beyt, behsa baweriya bi kîtabê xwedê te‘ala 8 beyt, behsa baweriya peyxemberê xwedê te‘ala 10 beyt, behsa wesfê Mûhemmed sellallahû te‘ala ‘eleyhi wesellem 69 beyt, behsa ‘elametê qiyametê 31 beyt, behsa baweriya qiyametê 37 beyt, îstîxase û hewâr 24 beyt e. Bi giştî 208 beyt e. Her çar beytên pêşî ev in:

*Bi hemdê Xwûda yê ku tewfîq ji wî
Bi şukrê Xwûda yê hîdayet bi wî
Selat ser Mûhemmed nebîyyê di wî
Di gel al û eshab û etba‘ê wî
Birayê musulman ji dil guh bide
Ewê ferdû‘eynin di dînê te de
‘Eqîdê beyan kim tu guh lê bikî
Ji bo ê nezan dînê xwo fehm bikî*

4.3.6- Mela Mihemmed Şah el-Metmûrî - ‘Eqîdetî’l- Îslamîyyetî Wel Mew‘izetî’l-Hesenetî (m.2002)

Li gor nusxeya li ber destê me di sala 1996an de hatiye nivîsandin. Di serî de bi du beytan wiha dibêje;

*Bi nûnekî sakî çêkim ez nîzam
Da ‘îşqê bigirin qulûb ê sûmam*

*Di ‘ilmê ledun de bikin tum dewam
Pê hîn bin temamên biraê ‘ewam*

Piştî van her dû beytan beşa destpêkê heye. Ev beş 15 beyt e. Piştî vê beşê ‘eqîde di bin sernavê ‘Mebhesa ‘Eqîda Îslamê’ dest pê dike. Ev behs ji 99 beyta pêk tê.

Hersê beytên serî evin.

*Bi navê Xwûda ê Rehîm û rehman
Em çêkin ‘eqîdek bi Kurdî ziman
Ji bo zanîna wan bira ê şîrîn
Bi rukn û erkân û fûrudat ê dîn
Bizanin nemînin di destê le”n
Ne kêşin ‘ezab ew di narê hezîn³¹*

4.3.7- Seyyîd ‘Ebdûlqadîr Erzen - Eqîda Îmanê Ji Bo Muminên Cîhanê (m.1962)

Di sala 2013an de hatiye nivîsandin. Bi tîpê latinî hatiye nivîsandin. Di serî de pêşgotineke bi mensûrî/pexşanî heye. Piştî vê pêşgotinê beşa *hişyarîyê* heye. Ev beş 12 beyt e. Nivîskar di serî de ruknên îslamê îzah dike. Paşê, bi berfirehî behsa ruknên îmanê dike û berhema xwe bi beşa *dawî* xilas dike.

Ev ‘eqîde ji hezar û du sed (1200) beytî zêdetir e. Bi vê hejmara beytên xwe, di dîyalekta kurmancî de ‘eqîdeya herî mezin e.

Hersê beytên pêşî ji ‘eqîda Seyyîd ‘Ebdûlqadîr Erzen ev in:

*Bi hemdîllah min çêkir ev kîtab e
Xwûda bo me bigerîne sewab e
Hemû me’na Ayet û Hedîsan e
Ne ku ji ber xwo min ev nivîsan e
Gelek pêwistî heye bi evan e
Ji bo xort û zarokên me Kurdan e³²*

4.3.8- Melle ‘Ebdulwehab Öncü (Bernîştî) -‘Eqîda Îmanê (m.1937)

Ji keyrê her duwazdeh rêzên bi secî ku wek destpêkekê xwuya dike, ev ‘eqîde ji 156 beytan pêk hatiye.

Serê Berhema Melle ‘Ebdulwehab wiha dest pê dike.

*Eeey birayê ‘ezîz û guhdar
Pir rind û pak û dîndar
Berê xwo bide rêya Xwûdayê Cebbar,
Berê xwo mede rêya kaş û çewt û xwar û mar
Ku ew rêya pîs, rêya şeytan ê xeddar
Hûnê bibin poşîman û belengaz û jar*

31 Abdulhadî Ertekin, *Mela Yasîn Yusrî û ‘Eqîdenameya Wî Ya Bi Navê Ed-Durru’s-Semîn (metn-lêkolîn-ferheng)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 6, 2017

32 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 6

*Bi şûnde vegarandin tune,
 Çuqas hûn bikin qêrîn û gazî û hewwar
 Guhdarî bikin ezê bo we bêjim tişteki bi nezm û qa'ide
 Ji dil hişyar bin tê da heye ji bo dînê we gelek faîde
 Bi navê Xwûda Xaliqê bê zewal,
 Gelek hemd dikim ez ji bo Zu'l-celal
 Li canê Mûhemmed resûlê hînar,
 Bibarin Selat û Selam bê jimar
 Digel al û eshabê Wî pîr delal,
 Ji bo dîn telef kirne pîr can û mal
 Piştî Bismelê, Hemdelê, Selwelê,
 Beyan kim bo we 'ehda Qal û Belê³³*

4.3.9- Mela Ehmed Nas (Zinarexî)-Xulasa 'Eqîda Musulmanê Sunnî (m.1937)

Di sala 1992an de hatiye nivîsandin. Mela Ehmed Nas, beşên berhema xwe bi navê 'Behs' ji hevûdû veqetandiyê. Di bin *Behsan* de 'Fesl' bi cih kirîye. Berhem ji 3 behs û xatîmeyekê pêk hatiye. Behsa yekem, 33 beyt e. Behsa duwem, 84 beyt e. Behsa sêyem, 218 beyt e. Xatîme, 123 beyt e. Bi tevahî digihêje 458 beytan.

Hinek beytên 'eqîdeya Mela Ehmed Nas ev in :

*Nuho ku me halo nîyet kirî ya
 Em çêkin li ser mezhebê Sunniya
 'Eqîdek-ji nezana re hem zarûwa
 Bi Kurmancî bî ew bi ezmanê wa
 ...
 Heye bawerî me bi resûlê Xwûdê
 Digel wê şeri'et û teblîx didê*

*Bi ehkamê teklîfîyû wed'îye
 Mêr û hurr û jêra wehî hatiye³⁴*

4.3.10- Mela Yasîn Yusrî (Mele Yasînê Şemê)-Ed-Durru's-Semîn (m.1906-1994)

Hem bi teşeya nezmê û hem bi cûreyê berhema *Mesnewî* ye. Qalibê 'erûzê; mûteqariba heşt pêngavî nesalim (mehzûf) e. Kêşa wê *fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl* e. Bi giştî 72 beyt e.

33 Abdulhadî Ertekin, hb. r.7

34 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 7-8

Beyt 1-4: Her çar beytên pêşî hemdê Xwedê û selewatên li ser Resûlê Xwedê, malbat û heval û yarên wî ne.

Beyt 4-6: Naveroka bawernamê cih digre.

Beyt 6-9: Sebeba nivîsandina berhemê aşîkar dike.

Beyt 10: Navê berhemê diyar dike.

Beyt 11-13: Hejmara ruknên îmanê dibêje û pêwistiya baweriya bi wan rave dike.

Beyt 14-24: Bi yazdeh beytan ruknê îmanê ê yekem ku baweriya bi Xweda ye şîrove dike, sifate Xweda ê zatî, subûtî, wucûdî û ezeli yek bi yek bi xwendevanan dide nasîn.

Beyt 25-33: Ji ruknê îmanê ê duyem, baweriya bi firîşteyên Xweda û naskirina hinek firîşteyan em di van beytan de dibînin.

Beyt 34-48: Ruknê sêyem ji ruknê îmanê baweriya bi pirtukên ku Xweda sandiye ji insanen re, çend suhûf/rûpel ji kîjan pêxemberî re hatiye, kîjan pirtûk ji kîjan pêxemberî re hatiye, giringiya Qurana pîroz û hinek wesfên Qurana pîroz em di van 15 beytan de agahdar dibin.

Beyt 49-55: Bi heft beytan baweriya bi pêxemberên Xweda ku ji ruknê îmanê ê çarem e hatiye an ravekirin. Sifetên pêxemberan û hinek taybetiyên wan jî em di van malikan da dibînin.

Beyt 56-64: Ji ruknê îmanê ê pençem baweriya bi roja qiyamet û heşrê ye. Girîngiya vê rojê, amadekirina cehennemê, pira siratê, weznandina xêr û gunehan em bi neh beytan dinasin.

Beyt 65-67: Ev her sê beyt mijara qederê ku ruknê şeşem e tîne zimên.

Beyt 68-69: Bi du malikan hejmara ruknê îslamê û navê wan sedema baweriyan çi ye bi hêsanî, bi zimanekî herikbar û şa’îrane aniye pêşberî me.

Beyt 70-72: Mela Yasîn di beyta 70an de ji xwe re dû’a kiriye û di her dû beytên dawî de jî selat û selamê Xweda ji pêxemberê me Muhemmed (a.s.) û heval û hogir û malbata wî re xwendiyê.

Herdû beytên pîşî;

Dikim bo te şukr û senaya kerîm

Bikî tu bi wan zêde serme ne’îm

Her dû beytên dawî:

We hem di li ser al û sehbê kiram

We etba’ê wan ta bi roja kiyam³⁵

35 Abdulhadî Ertekin, hb. r. 14-25

4.3.11- Mele Xalidê Zengokî Batikî- *Menzûmeya Eqîdeyê (m.1978)*

Ji destpêkek û 18 beşan pêk hatiye. Li gor hejmara beytên herdû rûpelên pêşî û rûpela dawî divê ev ‘eqîde 651 beyt be³⁶. Ji aliyê naverokê ve mijara berhemê; ruknê îman û Îslam û pirsên fiqhê ne.

‘Eqîde weha destpê dike;

Bi navê Xudayê hemî mexluqat

Ku Ellah e daîm bi navê lîzat

Errehmanî rizqa dide ew semed

Errehîmî rehmê dike bê ‘eded

Eqîde dibêjim bi îznê Xuda

Elhemdû lîllahî di her lehzê da

Bi van beyta bi dawî dibe;

Ya ‘ebdek azad ke ji bo rojekî

Ya du meha rojî bigir weqtekî

Weyaxud te’am bide şêst fuqara

Hem bi girî tewbe bike pur cara³⁷

4.3.12- Mele Ebdulhadiyê Comanî- *‘Eqîdeya Îmanê (m. 2004)*

Bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin. Li gor îstînsaxa Zeynelabidînê Amidî di nav 13 rûpelan de ku di her rûpelekê de 16 beyt cih digire hatiye nivîsandin. Beşa ‘eqaîdê û li dawîyê beşa îlticayê wek du beş di vê ‘eqîdeyê de ne. Li gor hejmara rûpelan û beytên di rûpelan de bi cih bûne divê ev ‘eqîde ji 190 beytan pêk hatibe.

‘Eqîde weha destpê dike;

‘Eqîdem ev e pê dibim Musluman

Li ser her kesî ferz û ‘eyn e bizan

Çi erkanê Îslamê pêncin yekîn

Şêşin yê Îmanê ji bo ehlê dîn

36 Abdullah Ekici, *Zeynelabidînê Amidî: Jîyan Berhem û Xebatên Wî Yên Destnivîsî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 177, 2014

37 Abdullah Ekici, hb.r. 84-85

Û bi van beyta bi dawî dibe;*Di sala hezar û we sî mîetê**Di gel heştêyû çarê çû j hîcretê**Di bîstê temûzê di weqtê duha**Ji bo nazîmê zarî el fatîha³⁸***4.3.13- Şêx Ehmedê Feqîr - Menzûmeya ‘Eqîdê (m.1832)**

Ev ‘eqîde ji deh beşan pêk hatiye. Cudahîya vê ‘eqîdeyê ji yên mayîn ev e ku menaqêbê her çar Xulefayê Raşîdîn, Hezretê Hesen û Huseyîn û Şêx ‘Ebdulqadirê Geylanî jî di xwe de girtiye. Nivîskar ji bo her yekî beşek amade kiriye. Bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin û bi tevahî 163 beyt e. Taybetmendiyê vê berhemê ev e ku herdû beşên pêşî û beşa dawî ne tê de her heft beşên din her yek bi 14 beytan hatiye nivîsandin.

Destpêk weha ye;*Ser defterê îsmî îsmê Allah**Daîm ew e muste‘an billah**Îsmê te ye îbtîdaê esma**Zatê qedîme la kel eşya***Bi van her dû beyta bi dawî dibe;***Ya Rebbî tu bikî bi heqqê Bazî**Ji Ehmed tu xerabiya ne xwazî**Lewra mûtemessikê terîq e**Barî bi wîra bibe şefî’ e³⁹***4.13.14- Hacî Ebdulfettahê Hezroyî - Menzûme Fi’l-‘Eqaid (m.1892-1975)**

‘Eqîdeyê biçûk e. Bi teşeya qesîdeyê hatiye nivîsîn/nûsîn. Bi giştî 63 beyt e. Destpêk weha ye;

*Di tewhîda Xwûda da ‘ebdê kemter**Di bêje nezîmkê wek ‘uqdê cewher**Qedîme xaliqe mewlaye mewsûf**Bi ewsafê kemalê ey hunerwer*

38 Abdullah Ekici, hb.r. 119-120, 193

39 Mehmet Zahir Ertekin, *Şêx Ehmedê Feqîr û Dîwana wî*, Arşîwa taybet. Ev behrem bi pîtê ‘erebî bi nivîsa başûr hatiye nivîsandin. Wek pdf li ber dest e. Lê ji ber ku bê berg e nivîskar û weşanxane ne diyar e.

Dawî bi van beyta di qede;*Îlahî rehmeta te bom e meqsûd**Li fethî tu birêj feydê ji her dur**Tehîyyat selat û hem selaman**Li mewlaê mew hem cumle perwer⁴⁰***4.3.15- Mela Muhammedê Hezanî- ‘Eqîdetu’l-Îman (m.1939)**

Bi teşeya mesnewîyê ava bûye. Bi giştî 118 beyt e. 78 beytên serî ‘eqîde ye. 40 beytên dawî fiqh e. Mijarên fiqhê bi sernavê ‘fesh’ê wek beşekê bi navê ‘fi beyanî be’zel mesâilî’l-fiqhîyyetî’ cuda kiriye.

Her dû beytên pêşî evin;*Navê Allah her tû wî dest pê bike**Hem li pey Rehman Rehîmî çê bike**Hemdê wî ket û ji ber in’amê tam**Ber Mûhemmed sed selat û sed selam***‘Eqîde bi van beyta xilas dibe;***Ey Mûhemmedê Hezanî her mûdam**Bêje ber Ehmed Mûhemmed sed selam**Esselat û wesselamû ya Resûl**Al û eshabê te bin sahib qebûl**Tarîxa hicrê ji bo nezmê bizan**Xeyn û ta û cîm jimar be ey cûwan⁴¹***4.3.-16- Mele Nesreddînê Zoqeydî- Eqîdetu’l-Îman (m. 1935)**

Destpêk, erkânû’l-îslam, erkânû’l-îmanî, mebhesî ehwalî ebnaî’ d-dûnya we’zzecrî ‘enha û mebhesî rîcael feqîr îleyhî subhanehû we te’ala ed-du’âî lî nefsihî we lî walîdeyhî wek çar beşên sereke di ‘eqîde de bi cih bûne. Di binbeşa erkânû’l-îslam de her pênc rûknên îslamê û di binbeşa erkanul îmanê de jî her şeş rûknên îmanê cih digire. Ji van beş û binbeşan mijarên ‘eqîdeyê jî eşkere dibin. Bi giştî 152 beyt e û bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsandin.

40 Doskî, Hb. r. 46-50

41 Doskî, H.b. r. 61-70

Bi van beytan dest pê dike;

*Bi navê Xwûda ez dikim îptîda
Çi navekî şîrîne navê Xwûda*

*Digel hemd û medh û sena û şükür
Ji bo wî Xwûdaê ku emrê me kir*

Beytên dawî evin;

*Di mîzanê bêje mebe tû melûl
Fe‘ûlun Fe‘ûlun Fe‘ûlun Fe‘ûl*

*Di nam û di weznê bibe tû besîr
Fexuz îinne haze’l-emre yesîr*

*Xwûdê rehmêtê ke li nazim mûdam
Digel esl û fesh û hewaşî tamam⁴²*

4.4- ‘Eqîdeyên ku em negihîştin wan

- Şêx Ebdullahê Şemdînî -*Xulaseyê Eqâid*.
- Şêx Muhemmed Hezîn -*Cewheretu’l-Îman*, 200 beyt.
- Hacî Ebdulfettahê Hezroyî -*Tercumeya Bed’ul-Emalî*.
- Şêx Hebibê Qadî -*Menzûmeya ‘Eqâid*.
- Mele Yasîne Şemê -*Tuhfetu’l-Esdîqa*, 333 beyt.
- Mele Ebdulhadiyê Comanî -*Manzûme fî-ridde*.
- Mele Ehmedê Delikî -*‘Eqîdetu’l-Îman-Gulçiqîna Xort û Zarokê Kurdan*, 418 beyt.
- Şêx Mûsayê Mêrdînî
- Muhemmed Helîmê Xursî
- M. Şefîk Aksu⁴³
- Mela Nûrulahê Godişkî: *Çenta Yetîman*⁴⁴
- Şêx Sahib Varol (m. 1983), *Eqîdeya Îmanê*⁴⁵
- Mela ‘Elî ‘İlmî -*‘Eqîde*⁴⁶

42 Doskî, H.b. r. 29-42

43 Zilan, hb. r. 18-19

44 Abdurrahman Adak, *Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê*, The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, Havîn 2016, r. 39

45 Abdurrehman Adak, *Nêrîneke Giştî Li Ser Helbestvanên Kurdînus yên Herêma Şîrnexê*, Nûpelda, hejmar 9, behar, 2012, r. 29

46 Necatê Zivingî, *Dîwana mela ‘Elî ‘İlmî-Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, Banqa Heq, 2012, İstanbul, r. 33-34

ENCAM

‘Eqîdeyên menzûm çawa cih didin xwe hevok bi awayekî din bê vegotin dê baştir be. Wek mînak: cihê xwe di edebiyata kurdî de girtine.

‘Eqîdeya Mewlewî a bi navê *‘Eqîdey Merdiyye* ‘eqîdeya herî mezin e. Bi devoka Soranî hatiye nivîsîn. Hejmara beytên wê 2441 e.

Bi devoka zazakî bi giştî 5 ‘eqîdeyên menzûm peyda bûne.

Bi devoka kurmancî gelek ‘eqîdeyên menzûm hatine nivîsandin. Em gihîştin 16 berheman û me danasîna wan kir, 13 ‘eqîdeyên menzûm jî di lîteratura Kurdî de em ji hebûna wan agahdar in lê em ne gihîştin wan.

Bi devoka Kurmancî cara yekem Şêx Ehmedê Xanî ‘eqîdeyeke menzûm nivîsandiye û bandor li nivîskarên piştî xwe kiriye.

Mela Muhemmedê Hezanî hem bi devoka Zazakî û hem bi devoka Kurmancî du ‘eqîdeyên menzûm nivîsandiye.

‘Eqîdeya ku beşê wê herî zêde ye ‘eqîda Mewlewî ye. Hejmara beşên wê 40 e.

Bi tevahî ‘eqîdeyên menzûm bi teşeya mesnevîyê hatibin nivîsandin jî lê cureyên wek qesîdeyê jî tîn dîtin.

Bi tevahî ‘eqîdeyên menzûm bi tîpê ‘erebî hatibin nivîsandin ‘eqîdeyên bi tîpê latinî hatine nivîsandin jî xwuya dibin.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê*, The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, Havîn 2016, r. 39

Adak, Abdurrahman, *Nêrîneke Giştî Li Ser Helbestvanên Kurdînivîs yên Herêma Şîrnexê*, Nûpelda, hejmar 9, behar, 2012, r. 29

Akçay, Ali İhsan, *Türk Edebiyatında Manzûm Akâidnâmeler: İnceleme Metin*, Doktora Tezî, Uludağ Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İslam tarihi ve Sanatları Ana Bilim Dalı, Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı, 2011, r.5-6

Aydın. Ahmet, *Manzum Fıkıh Metinleri – I*, Usul İslam Araştırmaları, Sayı: 26, Temmuz-Aralık 2016, ISSN 1305-2632, s.137-147

Çelik, Ahmet, *İnanç Eğitimi Açısından Mağrib’te Kadınlara Yönelik Yazılan Akîde Eserleri*, Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, h. 43, Erzurum 2015, rr. 442-446.

- Çiftçi, Metin, *Eqîdenameyo Zazakî Yê Mela Mehemedê Hezanîyê*, (Metno Transkrîbe kerde, Wekenitîş û Açarnayîş), Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yüksek Lisans, 2015
- Çiftçi, Metin, *Edebîyatê Zazakî yê Klasîk de Eqîdenameyî*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, Yıl:1, Cilt1, Sayı 2, Kasım 2015, r.117-119
- Doskî. T.Î, '*Eqîdenameyên Kurmancî*, Çapxaney Hecî Haşim, r. 19, 26, Hewlêr, 2010
- Ekici, Abdullah, *Zeynelabidînê Amidî: Jiyan Berhem û Xebatên Wî Yên Destnawîsî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r. 177, 2014
- Ertekin, Abdulhadi, *Mela Yasîn Yusrî û 'Eqîdenameya Wî Ya Bî Navê Ed-Durru's-Semîn (metn-lêkolîn-ferheng)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, r.6, 2017
- Ertekin, Mehmet Zahir, *Şêx Ehmedê Feqîr û Dîwana wî*, Arşîwa taybet. Ev behrem bi pîtê 'erebî bi nivîsa başûr hatiye nivîsandin. Wek pdf li ber deste. Lê ji ber ku bê bergê nivîskar û weşanxane ne dîyar e.
- Karaca, Songül, Kadızâde *Mehmed Efendî, Manzûme-i Akâid*, (inceleme-tenkitli metin- sözlük-dizin), Yüksek Lisans Tezi, recep tayyip erdoğan üniversitesi sosyal bilimler enstitüsü türk dili ve edebiyatı anabilim dalı, 2012, r.3
- Kılavuz, Ahmet Saim, "*Akâid*", DİA, cild, 2, s, 212.1989
- Mehwî, *Dîwanî Mehwî*, wêşanên Nefel, r. 120-132, Stockholm, 2007
- Mewlewî, -'*Eqîdey Merdîyye*, lêkolînewe û lêkdanewe mela 'Ebdulkerîm Muderris, pêndaçûnewe Fatih 'Ebdulkerîm, muntedî îqres-seqafî, 1988
- Qoxî, Ahmet Hilmi, *Rehberê 'Ewam Şerha Nehc ul-Enam*, İhsan Yayınları, İstanbul, 2004
- Sevgi, Ahmet, *Molla Câmî'nin Akâit Risalesi ve Türkçe Manzûm Bir Tercümesi*, Selçuk Üniversitesi, Edebiyat Fakültesi Dergisi, Yıl 2011, Sayı 26, s.1-4
- Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî Külliyyatı II*, '*eqîdeya İmanê*, Avesta, r.42, İstanbul, 2008
- Zilan, Bilal, *Di Kitabê Muhemmedê Şêx Ensarî: "Raro Raşt" û "me'lûmatê Dînîye"* (metn û cîgêrayîş), Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtûya Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan, Tezê Lîsansê Berzî, r. 24-25, Mêrdîn, 2016
- Zivingî, Necati, *Dîwana mela 'Elî İlmî-Jiyan, Berhem û Helbestên wî*, Banqa Heq, 2012, İstanbul, r. 33-34



ŞİİRİ MULEMMA Ê ŞAİRANÊ EDEBİYATÊ ZAZAKİ

The Poems Of Zaza Poets Written In The Form Of Mulemma

Zaza Edebiyatı Şairlerinin Mulemma Şiirleri

Murat VAROL¹

XULASA

Mulemma, edebiyatê klasik dı şîira ki bı çend zıwanan ameya nuştış, nameyê inê şîiran o. Şîira mulemma şîirêka zor u çetin a; çunki ina şîir dı şair, hunerê xu yê şîir mojneno ra u zıwananê ki zaneno pê inan şîira xu nuseno. Şîira mulemma dı bendê zıwanan çin o, ya zi yo qeydeyo qeti zi çin o. Şair bı hunerê xu yê şîir, şîira xu ano meydan. Ini şîiri hum bı şıklê beyit hum bı çarrêzi hum zi bı pancrêzi nusiyeni, ya zi bı şıklêko serbest zi yeni nuştış. Şair kamci rêz dı çı zıwan şıxulneno, bı tercihê şair bewli beno. Edebiyatê Zazaki ê klasiki dı çar şairan terzê şîira mulemma dı şîiri nuştı. Ini şairi Ehmedê Xasi, Usman Efendiyê Babiji, Mela Mehemedê Kavari u Mela Ezizê Cebexçuri yi. Ini şîiri her çıqas eyni tewır dı nusiyayi zi benateyê inan dı zaf ferqı estı. Ina xebat dı; çar şairi edebiyatê klasiki ki bı terzê mulemma şîiri nuştı, heyatê inan ra bı kılmi behs beno, dıma şîiri mulemma ê ini şairan diyeni u tetkik beni.

Çekuyi Muhimi: Edebiyatê Klasik, Mulemma, Şîir, Zazaki.

ABSTRACT

Mulemma is a term used for poems composed in multi-languages. The mulemma-style poems are the the most difficult ones in terms of poetic forms, because the poet both shows his ability in the poetry and his competency of knowing various languages. There is no boundary for the languages the poet

1 Wezifedarê Musnayışi, Üniversiteya Bingoli, mvarol@bingol.edu.tr

knows. These types of poems may be written both in quadrants and quintettes. The usage of various languages in the line of verses is determined by the poet. Four poets have written in mülemma-style in the Classical Zazaki Literature; Ehmedê Xasi, Usman Efendiyo Babîj, Mullah Moahamad Kavari and Mullah Aziz Cebexçuri. Although these poets wrote in the same style, their mulemmas differ in many ways. This article is about the lives of these four poets and the analysis of their mulemmas.

Key Words: Classical Zazaki Literature, *mülemma*, poetry, Zazaki

ÖZET

Mülemma, klasik edebiyatta çok dilli şiirler için kullanılan bir terimdir. Mülemma tarzı, şiir şekilleri içerisindeki en zor türlerden biridir, zira şair bu şiir türüyle; hem şiir yeteneğini göstermekte hem de kaç dil bildiğini ortaya koymaktadır. Mülemma şiirinde kullanılan diller için herhangi bir sınır bulunmamaktadır. Bu tarz şiirler hem beyit hem dörtlük hem de beşlik şeklinde yazılabilmektedir. Hangi satırda hangi dilin kullanılacağı şairin tercihinine göre şekillenmektedir. Klasik Zaza edebiyatı şairlerinden dört şair, mülemma tarzında şiir yazmıştır. Bunlar Ahmed-i Xasi, Osman Efendiyo Babîj, Molla Muhammed Kavari ve Molla Aziz Cebexçuri'dir. Bu şairler, her ne kadar aynı tarzda şiir yazmış olsalar da yazdıkları mülemma şiirleri arasında büyük farklar bulunmaktadır. Bu çalışmada; adı zikredilen mülemma şairlerinin hayatlarına kısaca yer verilecek ve sonrasında da bu şairlere ait mülemma şiirleri incelenecektir.

Anahtar Kelimeler: Klasik Edebiyat, Mülemma, Şiir, Zazaca.

1. DESTPÊKERDIŞ

Kelimeya mulemma manaya 'reng reng ya zi rengo têmonayî' dî yena şıxulnayîş. Edebiyato klasik dî ma kelima, terzê şiir vera yena şıxulnayîş. Edebiyato klasik dî şiira ki zaf zıwanan ra ameya meydan, nameyê inê şiiran o. Ino terz dî zafi ra yo rêz yo zıwan dî rêza bin zi yona zıwan dî nusiyena. Têkî mulemmayan dî zi miyanê yo rêz dî ciya zıwani zi yeni şıxulnayîş (Pala, 2000: 299). Yo şairi wext bîwaştên yona zıwan dî şairtiya xu ramocno u nameyê xu bido eşnawıtış ino terz dî şiir nuştên; labelê wextêk ra pê ino terz hetê şairanê namdaran ra zi ameyo şıxulnayîş (Pala ve Kurtuluş, 2006: 539).

Şiira mulemma, dî qeyde nusiyena. Eg zerreyê yo qısım dî her rêz pê yo zıwan biyero nuştış, cı rê vaciyeno mulemmaya tam. Eg zerreyê yo rêz dî ciya zıwani biyeri şıxulnayîş, ino tewr zi beno telmi (Aksoy, 1993: 132).

Diwanan dî qê şiiranê mullemma cayêko xısusî çin o. Şiiri mulemmayi ki bî

terzê gzel nusiyayi miyanê gzelan dı, şiiri ki bı terzê qeside nusiyayi miyanê qesideyan dı, şiir ki bı terzê musammat nusiyayi ini zi miyanê musammatan dı ca geni. Labelê ge ge diwanan dı sernuşteyê şiir dı zê ‘qesideya mulemma, gzelâ mulemma’ nusiyeno u bı ino qeyde xısusiyetê şiir nişan diyeno (Ünver, 1998: 11).

beni hewt tebeqeyê binê erdan. Her çendik mewzuyê vistonikan xeyali bibo zi, esasê xu di mewzuyê xu cuyayiş u kulturê ê mîleti ra geni. Mîletanê ciyayan dı, temayê vistoniki eyini bibo zi bi ferqanê qickekan vajiyeni.

Zazayan dı namekerdişê vistoniki zaf ê. Vanê “sanike”, “estaneke”, “estanike”, “estoneke”, “estonike”, “vistaneke”, “vistanike”, “vistonike”, “şanike”, “sonike”, “sûnike”, “şonike”... Beno ke çend formê bînî zî estbê la kokê xu tim yew o (Yıldırım-Lezgin-Bingöl, 2012:50).

Vistonika Waya Hewt Birayan; dekewena tewirê vistonika xeyali. Miyanê tewirê vistonikan dı tewr ziyed ê xeyali yena zonayiş. Çêşitê nê sanikan, ê bînan ra gore tenêna derg ê. Karakteri zaf ê. Nê karakterî leyê însanî de dêvî, ejderhayî, cînî, çaju yê. Hem mewzûyê xo hem kî cayê xo rastîken nîyê. Ne sanikan de sir û tilsimî zaf î (Aldatmaz, 2014: 57). Na vistonik miyanê Zazayan dı zaf vıla biya, xêylek varyantê yê esti la ma çahar varyantanê ina vistonik muqayese kenî.

2. ZAZAKÎ DI VISTONIKAN SER O XEBATÎ VÊRÎN

Vistonikanê Zazaki ser o hêveri Kurdologê Rus Peter Ivanoviç Lerch, serra 1856 dı herbê Kırım dı Zazayi ki hêsir gêriyayi inan reyde qısey keno u nê metnanê folklori serra 1857 dı weşeneno. Peter Lerch kîtabî xo yê “*Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer (Derheqî Kurdan u Keldanîyî Bakûr yê Îranî de Cigerayîşî)*” de 7 metnî kirdkî neşir kerdî.... Verî hetî nuştox/ cîgêrayox Mehemed Malmîsanij ra bi alfabe ya latînî ya Kurdkî (Alfabe ya Celadet Bedirxan) newe ra ameyî nuştîş yanî ameyî transkırîbe kerdîş û 1986 de kovara Enstîtuyî Kurd Parîs “Hêvî” de ameyî çap kerdîş (Malmîsanij 1986, 5/ 88-91; 6/ 69-79) Nê textan ra hirye hebi vistonik i (Kurîj, 2014:105). Estaneka Hîrê Birayan, Damarî, Çemçeçû Paşa (Yıldırım-Lezgin-Bingöl, 2012:21-24, 28-31) Xebata dıyın hetê zıwannaşê Alman Albert von Le Coq ra serra 1902 dı Şam dı biya, hikayeyi Kurmanci u Zazaki arêdayi u bi nameyê *Kurdische Texte/ Kürtçe Metinler* Berlin dı serra 1903 dı neşir kerdî. Ino kitab dı panc hikayeyi Zazaki esti. Benateyê serranê 1906-1907 dı zıwannaşê Alman Oskar Mann Sêwregi, Bucak, Cebaxçur, Kur u Gexi dı xebat kerdo. Dıma Karl Hadank inê metnan newe ra analiz keno u bi nameyê *Mundarten der Zaza* serra 1934 dı neşir keno (Çağlayan, 2016:101). Ma veyneni ki; folklorê Zazayan ser o hêveri zıwannaşê xeribi cîgêrayîşî kerdî. Weşanayîşê nê metnan ra pey hetani serra 1980 metnê vistoniki Zazaki nêweşanyayi

Serra 1980 ra dima Tırkiya u bızafi Ewropa dı; ked u fedakariyê xebatanê şexsi u komi zaf kovar u kitab çap biyi. İnan ra humara çaharın a kovara Roja Welat dı bi nameyê *Koremore* yew vistonik çap biya (Roja Welat, 1978:12). Nê ra pey vistonika dıyın “*Xal û Wariza*” zi kovara Tirej, humara dıyın dı weşaniyaya (Tirej,

1980: 60-62). Varyantê vıstonika ma eyne kovar dı humara hırın dı bı nameyê, “Pıra Hewt Sera” ca gırewta (Tirej, 1980: 52-57). Dıma kovari vera bi ziyed u eğleb meteryalê folklorê feki weşaniyayi.

Kitabê ki tede vıstoniki esti; inan ra kitabo tewr vêren, kitabê folklori; *Folklorê Ma ra Çend Numûney* (Malmîsanij, 1991) o. Kitabê ki zerreyê ey dı teyna vıstoniki ca geni *Fıstonik* (Yılmaz-Temi, 1998) u *Luye Be Biza Kole Ra* ma eşkeni misal bıdı (Çem, 1998). Inê serran dı tayi nuştoxi, folklorê mıntıqayê xu arêdayi u çap kerdi. *Tanî Estanikî u Deyîrê Ma* (Espar, 1995), *Folklorê Kurdî; Kurmancî û Dîmîli* (Verroj, 1995), *Gingim Zereyê Ma De* (Gedik, 2004) u ma eşkeni vaji, piyeri mıntıqayanê Zazayan dı kitabê vıstonikan neşir biyi. Bı nameyê vıstonika ma zi yew kitabê vıstonikan çap biyo; *Wayê Hot Birayûn* (Kurij, 2002).

3. MUQAYESEYÊ VARYANTAN

Vıstonika ki ma waşt tehlil bıki, xeylêk varyantê yê esti, la ma na xebata xu dı çahar varyantanê na vıstonik muqayese kenî. Hêveri vatışê vıstonikan dı, xısusanê zıwanê feki yê mıntıqayi veciyena verê ma. Ma ina xebat dı qê varyantê Çolig; vıstonika Yo Way û Howt Birayî (Bor, 2013:201-211), qê varyantê Sêwregi Waya Hewt Biraran (Adabeyî, 2005:81-84), qê varyantê Licê Hera Herrîne (Licokic, 2007:73-86), qê varyantê Dêrsim zi vıstonika Hera Weline (Çelker, 2005: 83-98) gırewt. Sebebê tercihkerdışê inê varyantan inî çahar vıstoniki zi seni ki ameyi vatış, o qeyde nusiyayi, yani fêkê mıntıqayi rê mudaxele nêbiyo u bı goreyê varyantanê binan hina dewlemend u derg nusiyayi. Labelê ma şuxulnayışê zıwanê feki ra vêşer, vatışê vıstonika mıntıqayi tehlil kenî. Yani urf u edet, coğrafya u itiqad, vıstonikan ser seni tesir kenî ma na xebatê xu dı inan ser zi vındeni. Her vıstonik cayo ki tede vajiyena, goreyê uca bedilyena, tayê çıyanê newe gena yan zi erzena. Rawrê vatox; qehremanan, rolan, nameyan u vatışê vıstonik bedilneno. La meqsed u temaya vıstonik muhefeze keno.

3.1. Uslub u Zıwanê Varyantan

Zıwanê vıstonikan, zıwanê miyanê şari yo yani vıstanikan dı zıwanêko mehelli yeno qalkerdiş. Zıwanê vıstonikan, zıwanêko zelal u weş o. Xura sonıkvaji, miyanê şari dı cuyeni u her çiyi xu pê feki zıwanê mehelli vani.

Varyantê vıstonika Çoligi, goreyê xususiyetanê merkezi nusiyaya. İzafeyi, sıfeti, antişê wextan, wesıla zafi u çekuyi ê mıntıqayi, heme goreyê fêkê merkezi nusiyayi. Vıstonika Sêwregi dı; çekuyi ki a mıntıqa dı zaf şuxuliyeni, vejıyena verê ma u çekuyê Tırki zi tede esti. Misal çekuyi “çıcı, bol, qapi, coşmandê, qandê” esti. Varyantê Licê dı, çekuyi Kurmanci viyereni. Misal, “nêçir/seyd, agrır/adır, gav/gam, derbas beno/viyereno”. Varyantê Dêrsim dı, sarê ra heta peyni ma xususiyetanê fêkê zımayi vıneni. Misal; “çê, mordem, çêna, ebe, şodir, qayt kerden, koti, kamta, urzena”.

3.2. Formelê Destpêkê Varyantan

Zafiyerê vistonikanê Zazaki bî nê cumleyan dest pêkeni; “cay bi cay şî” (Malmîsanij, 2000:201), “tîya bî û çinê bî” (Licokic, 2007:73), “beno nibeno” (Çîçek, 2014:11), “rojêkî rojûn mîyûn di, helêkî helûn mîyûn di” (Mîrvanî, 2012:9), “cêk ben, cêk nîben” (Bor, 2013:9). Şuxulnayîşê nê cumleyan goreyê neqilkerdoxan bedilyeni. Varyanti vistonika ki ma etud keni, bî nê cumleyan dest pêkeni:

Çolig	Licê	Sêwregi	Dêrsim
Yo Way û Howt Birayî	Hera Herrine	Waya Hewt Biraran	Hera Welne
Cêk ben cêk nîben	Tîya bî û çinê bî	Beno nêbeno	Beno, nêbeno

Tablo-1: Formelê Destpêkê Vistonikan

Destpêkê vistonikanê Zazayan, tewr zaf pê cumleyanê corin destpê keni u ni zi goreyê sonikvajan bedilyeni. Mekan u qehramani vistonikan xeyali yi u wext zi niyeno zanayîş. Formelê destpêk, piyerê vistonikan dî standart o u hema hema eyni me’na dano. Tayê cayan dî zi vistonik, bî yew neqarat destpê kena u yew çiyê standart niyo rawrê zi bême’na yo. “Vistûnik şin da / Bebûrî cin da / Vistûrî har a / Mûnga çar a / Şîya axdara / Sil kerd mi lapat a / Mi sil kûwa ti kekat a / Gina rîyeştê ema / Raq a Gindê pîra Fat a” (Bor, 2013:9). Eğleb vistonikan dî zeman, ca u heqîqet muhim niyî. Vatox; hem mewzu, hem tema, hem zi teknîkê vatiş dî serbest o.

3.3. Karakterê Varyantan

Vistonik; goreyê urf u edet yani kulturê ê mileti, itiqad u cografyaya mıntıqayan bedilyena; bîzafi goreyê vatişê merdîman bedilyena. Eg wendox hişê xu bîdo karakteran ser; tesirê fekê mıntıqayi, bedilyayîşê karakteran dî zi veyneno. Inkê zi ma varyantanê vistonika xu, goreyê karakteran etud keni:

Çolig	Licê	Sêwregi	Dêrsim
Kênek	Keyneke	Keynek	Çênek
Dadîyê kênek	Dadî	Maya keynek	Maa çênek
Çendnê kênek	Hevalanê keyna	Keynekên	Hevalanê çênek.
Howt birayî	Hîrê birayî (‘Emer, Derwêş, ‘Elî)	Hewt birayî	Haut biray
Hera herrin	Herêka herrine	Wel ra istorê	Hera welne
Pisîng	Pisînge	Kutik	Pisînge
Pîra howtsarî	Pîrêka hîrêserî	Caduyer	Dêva haut seri
Howt kêne pîra howtsarî	Hîrê keynay pîrêdewe	Hewt keynê cadu	Haut çênê dêve

Lîyr mar/Marê pîzê kênêk	Lehîrê marî		Marê zerê çêneke
Cityer, lajê cityer			Şüani
Maro mîyûn telî			Marê teveri
			Khalê herdişsipêy
Hîrye qijî kênêk			Dî domani çêneke
Bıray qij			Çêna deva qıce
			Çêna deva pile
			Bırao çarçım

Tablo-2: Listeyê Karaktaranê Varyantan

Ma cor dî heme karakterê çahar varyantanê na vistonik nuşti. Ma veyneni ki, bî zafî karakteri şirik i. Serqehramanê hemeyê varyantan kênâ ya u zafiyerê sernameyê vistonikan dî nameyê kênâ esto (way). Vistonikan dî humarê hewt bimbarek a. Humarê bırayan, ê kênayan u sareyê piradew hewt i. Humarê tayê meknan u çiyê bini vistoniki zi hewt i. “...kueşka howtqat, û howt pîskênê adîr..” (Bor, 2013:203), “haut koa, haut lêano” (Çelker, 2005: 85-89). Motifê bırayo qıj zi, vistonikan dî zaf ca geno. Aqıl o, hem zi cumyerd o. Heme çahar varyantan dî rolê tayê karakteran yewi yê, la nameyê yin yew niyo, sewbina name gırewti. Karakterê ke şirik niyê, ma tesnif bıker:

Varyantê Sêwregi dî heywani kutık u astor esti, ê bin dî pising u her esti la rolê inan eyne yo. Her heywan sembolê yew tip u roli ya. Astor/ her yew embazo sadıq o. Pising wahaê xu rê bêbexti kena. Mar xayin u dişmen o.

Varyantê Çolig dî cityer u lajê cityer esti, varyantê Dêrsım dî şuani esto; huni rolê şuani u lajê cityer eyne yi. Hetê humaran dî varyantê Licê dî ciyati esto. Humarê bırayan, keynekan u sareyê pirêdew hirê yi. Hirê; biyayişê insani ra hetanê mergê insani temsil keno. Yani welıdayış, heyat u merg. Nameyê bırayan zi eşkera yo.

Varyantê Dêrsım dî baweriyê yin dî wahaê yew çayo muhim karaktere “Khalê herdişsipêy” u maro siya esto. Zafiyerê efsane u vistonikanê Dêrsım dî Khalê herdişsipêy (Xızır) yew merdimo wayirê hikmeti yo u karakteran rê hetkari keno. “..., wazeno nê kalê erdişsipêyê wayirê rîyê nuranî sey mêman Heqî dawetê keyeyê xo bikero. Xızır nê merdimi nêşikneno û şino keyeyê ey de beno mêman” (Aldatmaz, 2014:64) Miyanê bırayan ra yew zi çarçım o. Yew varyantê vistonika ma nameyê no karakter gırewto: Heso Çı’harçım (Hayıg, 2007). Mar u qıcı keynek vistonika Sêwregi dî çin i.

3.4. Rêzkerdışê Hediseyanê Varyantan

Ma rêzkerdışê hediseyan, goreyê şirikiyê çahar varyantanê vistonikan u goreyê varyanto tewr derg gırewt ki, wa derheqê vistonik dı malumatê ma bıbo.

Kênek şına miyanê embazanê xu, keynayan ra yewi tiz kena. Piyeri serê sareyê bırayê xu sund wuneni, la keynek serê sareyê golikê xu sund wunena. Embazanê keynek cı ra vani, hewt bırayi tu esti. Ya zi şına dadiya xu ra vona; ez wazena şiyeri, bırayanê xu weyni. Dadiya yê seba ki keynek wenış u pê şiyer, cı rê herr ra yew her vırazena. Keynek şına kueşkê bırayanê xu, piyor gureyê yin kena u xu limnena. Bırayi yê, yê mereq keni u nowet geni; dıma bırayo qıç, waya xu eşkera keno. Way u bırayi, bı yewbinan zaf beni şa.

Bırayi, şertê xu vani; tı gereka çıta werd barê pısing zi bıdı. Keynek yew hebê eskıj bê pısing wena u pısing zi yers bena, şına miz verdena adır ri. Dıma keynek şına geyrena adiri, şına verê kueşkê pıra hotsari. Keynaya pıra hotsari adır dana cı, la pıra hotsari keynek teqıp kena u yena verê berê yin. Gıştê keynek qula beri ra sıpena. Bırayi keynek, ewniyeni waya yin roj bı roj heliyena, qerar geni, voni ma nê çı eşkera bıker. Bırayo qıç xu limneno u pıra hotsari kışeno. Dıma zi bırayi şın, keynayanê pıra hotsari xu rê mare keni, oni keyeyê xu, bı keyfweşi heyatê xu rê dewam keni.

Veywanê keynek, cı ra xuy keni u liyrê mar erzeni miyanê aw u dani keynek. Pızê keynek maseno, veywi miyerdanê xu ra vani; waya şıma pize nêweş a. Bırayo qıç; waya xu geno, semedê way bıkişo beno yew kue/gem/çem la qemiş nêbeno uca dı verdeno, agêreno. Keynek zi zewt dana bırayê xu, vana wa yew aste şiyer/sunziyer bıyer lingê tu ra u dermanê tu ez bibi. Keynek şına raştê yew cıtyer/şuani yena u o merdım cı rê ardım keno u pızê yê ra mar veceno teber. Şuani/laj cıtyer keynek dı zewicyeno. Qıci yin beni u bırayê yê qey derdê xu yeno dewa yin. Way; derzin kuwena lingê bırayê xu, kena weş waha. Bıra; way u zomayê xu u warzaye xu geno, beno keyeyê xu. Hewt bırayi zi ciniyanê xu seba ki bêtum kerdı way, yin kışeni. Vistonik itya dı qediyena. Peyniyê vistonika Sêwregi bı kıştışê Caduyer qediyena. Peyniyê vistonika Lıcê, nê hirê hemın varyantan ra zaf çiya ya.

3.5. Hetê Tedeyi Ra Ciyayiya Varyantan

Her çendık varyantanê vistonikan dı mesaj, motif u tema nêbedılyo zi, nê varyantan dı hetê tedeyi ra tayê çiyayi esti. Sonıkvaj yani merdımı ki vistonik neqlkeno; beno ki tayê çıyan xu vira bıko yan zi xelet bêro virê yi, ge-ge zanayış u xeyalanê xu ilawe bıko. Rawre zi sey yew vistonik zerê vistoniki dı pêdima bıvajo u tedeyiyê vistonik bıbedılno. Xususiyetê vistonikan dı yew zi pêyniyê vistonikan bı keyfweşi qediyeni. Na vistonik dı hırı meselayi bibi u pê keyfweşi qediyena. Varyantanê vistonik dı çı tewır çiyayi esti ma ino qeyde hina hol fom keni.

Qısimê yewın; destpêkê vistonik ra heta ki keynek bırayanê xu ca kena. Qısimê diyın; bı diyayışê bırayan ra dest pêkeno u heta bırayo qıj pıra hotsari kışeno u

birayi, keynayanê pir dı zewıcıyêni. Qısımê hirın zi keynayan marekerdış ra dest pêkeno u heta peyniya vistonik devam kenno.

3.5.1. Ciyayiya Qısımê Yewın

Destpêkê vistonika Dêrsim hina teferruatın o. Mergê piyê inan ra u sebebê raywantiya bırayanê keyneki ra zi behs kenno. Varyantanê binan dı imi çin i. Destpêkê bıyayê hîrê varyantan şîrîk î labelê varyantê Sêwregi dı kênayî ra yewî tîz nêkeno. Keyneki kuçe dı kay keni,...wija d' çiyên beno vinî. Keyney heme sond wananê.....Sira yeno nay se na vana: Bi serede herda ma yak or bo kî mi nêgiroto” (Adabeyî, 2005: 81).

Varyantê Çoligi dı keynek, seba ki raştê yew rue u yew mura (boncuk) yena u herê xu ra vona “hoşş” hera herrın dı rey pıxmıyel bena. Varyantê Licê dı hebêk mura u hebêk toq ‘erd dı vinena. Varyantê Sêwregi dı raştê komdê altunan u komê mucewheran yena. Varyantê Dêrsim dı raştê moreka bena. Têna varyantê Dêrsim dı, seba ki keynek yew rey herr ra vat “hoşş” hera welın yew rey rıjyena. Sewbina ciyati, varyantê Sêwregi dı keynek bena dêrsim, şına bena perde ra. Varyantê Dêrsim dı yew bırayê keynek çarçım o.

3.5.2. Ciyayiya Qısımê Dıyın

Wexto ki keynek şına adır kêynayê Piredêw ra gena u agêyrena; ma itya dı yew ciyati veyneni. Varyantê Çolig dı gındê lay yê gınena ard ro, lêfiyena yew teliya. Piredew; la kena we, piyêşena xu dest u keynek teqib kena. Na hedise, varyantê Licê dı hina ciyayo. Keynekanê Piredêw, “Ê anê sersoteyke agir, jo şerbikêke aw, jo şane, jo zî hîlo (ku zê sabûnî yo) dane keyneke, vanê:Gava nızdîkî ro to kerd, şerbikê aw berze. Go aw bibo çem û golî, go bibo derya. Heta înan ra bixelesîyo ti go henî şorê. Reyna nızdîkî ro to bikero, hîlo (hîro, îro) berze. Hîlo go bibo şeqetok, go bibo çamûr, go dadê ma bişeqetîyo, ‘erd o gino. Çıqa hêz bido xo, go reyna ‘erd o gino. Heta ê çamûr û çelxemî ro bixelesîyo, ti go henî zî şorê. Reya peyîne şane berze, şane go bibo dirrik û dirristan, go bibo dar û daristan, go bibo şax û şafil. Heta ê ra zî bixelesîyo, ti go şorê, bixelesnê” (Licokic, 2007: 79)

Varyantê Dêrsim dı kênaya dêva qıc, werê dani dana cı u vana ki; wexto ki ti kewt rayir daniyan berz erd. “... maa ma daniyê ke, to êştê hard, to dıma ina dana arê, axiri tenê xecelina, ebe na qêyde ti ki resena çê xo....” (Çelker, 2005:90).

3.5.3. Ciyayiya Qısımê Hirın

Yew ferqo qıçek varyantê Dêrsim dı esto. Varyantê Dêrsim dı, veywa pil têlê porê maya xu erzena miyanê aw, dana keynek. Na têla por, zerê keynek dı beno mar.

Yew ciyatiya pil varyantê Licê dı esto; hîrê bırayi waya xu cernbeni, waya xu beni verê yew la. Waya yin verê la dı rakuwena. Hirê bırayi xu keni dılqê yewnayi ki way, yin nêşmasna. Hirê qayıqan geni u verê la dı vındeni. Way bı xu hesiyena

u qey birayanê xu bermena. Hin itya ra dîma sêy yew lezvate yewbinan dî qali kenî. Ma nê qal kerdişi ra qîsmê lezvate dî behs kenî.

Varyantê Çolig u Dêrsim dî; birayo qij wexto ki waya xu kue dî ca verdeno, keynek zewt dana birayê xu, zewta keynek qebul beno. Varyantê Çoligi dî “Birawo, birawo, senî g’ ti ez hend tengzar kerda, sêr î n kûe ya têna ca verdawa, ti xwu ra xeyr nivîn. Ti şîyer fêk bêr kueşkê xwu kûîr, wû yo telê sûnzîyer şîyor ti ling a, wû o telî ristim bigîr, yo sunzîyer ti ling a bîyor, sûnzûn bigîr, ti kumca g’ şîyer qîj kerrûn sûnzîyer a kûer, sûnzûn ti ra bikîr, wû darî dermûn ti derzine mi b’!” (Bor, 2013:209). Raşt a zi birawo qij raseno fêk berê xu yew teliyê sunziyer şîno yi ling a.

Labelê zewta varyantê Dêrsim ciyaya. Keynek sey yew lezvate vana. Ma qîsmê lezvate dî ca dani, na zewt. Seni ki zewt dana birayê xu, zewta yê terefê Heqî ra qebul bena, astê marê kori şîno lingê birayo pil. Varyantê Dêrsim dî yew karaktero ciya esto (Khalê Herdişsipey) u vistonkanê na mîntîqa dî zaf viyerenî. Hz. Xızır, kalo erdişsipeye edebiyatê Zazayanê zime dî motifêko muhim o. Keynek raştê Khalê Herdişsipey yena, kal cî ra vano; serê no koyi dî êniyê mîrada esta, derdê tu rê bena derman. Keynek êni ra, awk şîmena. Zerê awkê ra yew maro şîya, marê zerê keyneki rê kuweno qîsey u marê zerê keyneki vejeno teber.

Varyantê Çolig dî; keynek şîna, nîzdiyê yew dew, kîştê yew hêgayi dî arisyena u yew cîtyer ra awk wazena, a hel yew marê miyunê telî, qalê xu erzeno serê marê zerreyê keynek. ”_Qaqibo, qaqibo, qaqibo,...Yo mar pîyezê kênek id, aw mar îz ben têsûn pîyezê kênek ra yen tever, ina kênek ben weş xwu ir xelisîyena” (Bor, 2013: 210). Marê zerê keynek zi qalê xu erzeno sêr marê miyun telî. “-Qaqibo, qaqibo, qaqibo, kûm adir berz in telî, in telî bivêşn, in mar tedi bimir, o cawo g’ mar, mar ho tedi ûja biken, yo lîyo howtqulp ho keqatî ra zerd” (Bor, 2013:210). Cîtyer vercê sêy marê zerê keyneki keno. Dîma zi sêy marê miyun telî keno. Mar sarê xu keno tever, cîtyer duno sarê mar kîşeno u keyna bena keyeyê xu. Dîma zi keynek u lajê xu zeweceno.

Varyantê Dêrsim dî keynek raştê yew şuanî yena, şuanî reydi zewicyena. La keynek, seba ki şuanî esl u cîsnê yê, cî ra pers nêkerdo, xu nana laliyê. Yew roj qîji danê yewbinan, keynek yers bena qîjanê xu ser u miyerdê yê zi pê hesiyeno ki keynek lal niya. Keynek meselaya xu, cî ra vona.

Yew ferq zi ameyişê birayo qij dî esto. Varyantê Çolig dî; birayê keynek yeno dew, qîjanê keyneki hê kay kenî, vinên yew miyerik (birayo qij) umo, şîni dadiya xu ra vanî. Varyantê Dêrsim dî, şuanî mali beno çirayneno, yew aspar yeno cê yi, şuanî miyerik (birayo pil) beno keyeyê xu.

3.6. Şirikiya Varyantan

Hediseya dest pêkerdişê çahar varyantan seycê yê. Varyantanê Çolig, Dêrsim u Licê dî; keynek şîna teber hevalanê xu dî kay kena. İnan ra yewi tiz kena u heme keyneki sereyê birayê xu sund wanenî. La seba ke waya hewt birayan

nêzana birayi yê esti, bî sereyê guelîka xu wa sund wanena. Varyantê Çolig u Licê dî dadi, herr ra her vîrazena. Varyantê Dêrsim u Sêwregî dî wel ra her/estor vîrazena. Varyantê Çolig, Dêrsim u Licê dî keynek wexto ki şîna keyeyê birayanê xu dî gureyê xu qedînena, xu yew ca dî limnena. Çahar varyantan dî zi birayo qij, waya xu eşkera kenô.

Varyantê Sêwregî dî lînga keynek gînena sıyın ro u bena guni. Heton kiye çilki guni lînge yê ra şîni u cadu guni teqîp kena. Varyantê Dêrsim dî zi gînena kemeri ra. Çahar varyantan dî piradêw qulê ber ra gîştê keynek sıpena u huni birayo qij dêw kîşeno. Piyeri varyantan dî birayi, kêneyanê piradêwi dî zewicyeni.

Varyantanê Çolig, Dêrsim u Licê dî veywi keynek, yew liyrê mar tepîşeni, erzeni zerrê destê aw/şerbîkê aw u wexto ki keynek aw şîmena, liyrê mar qırîkê yê ra şîno war. Varyantanê Çolig, Dêrsim u Licê dî veywanê keynek yew bêtum erzeni ayê ser. Huni varyantanê Çolig, Dêrsim u Licê dî birayo qij, waya xu bena ko/gem/vere çemi. Varyantanê Çolig u Dêrsim dî way pê yew derzin, a lînge birayê xu kena weş u bîra; way u zoma u qîjanê yin geno, beno keyeyê xu. Varyantê Çolig dî; hewt birayi, cîniyanê xu, qatîranê/astoranê vêşan u têşan ra girê dani u yin ra dur aw u vaş nuni ru. Vêşaniyê u têşaniyê ver, her yew qatır yew het ser a remeno. Ê weyvi piyor miyun dî, cîyera şîni u mîreni. Varyantê Dêrsim dî têna birayo pîl ceniya xu bî ino qeyde kîşeno.

Ma veyneni ki, varyantê Çolig u varyantê Dêrsim him hetê karakteran ra him hetê tedeyi ra zaf manenê yewbinan. Varyantê Sêwregî goreyê ê binan kîlm o. Varyantê Licê, mar kewtîşê pîzê kêneyi ra dîma zaf cîya ya.

3.7. Lezvateyi Varyantan

Vistonikan dî bî zafî diyalogî estî, qise kerdîşê qehremanan germ u zerra safira yi. Tayê cayanê vistonikan dî zewt, qalikerdîş u vengdayîşê karekteran bî zîwaneko şîrin u şîiri vajiyeno. Seba ki keyf bîdo goşdaran, vatox bî yew vatîşo neqîşnaye vano. Miyanê zafiyerê vistonikan dî lezvate esto. Lezvateyi sey şîir kafiyeyin i u rawrê zi tayê çekuyê ki tede vîyereni bême'na yi. Lezvateyê vistonikanê Zazakî dî, ge-ge zi Kurmancî esta. "Çuçîka min a çîçkanî / Tu hal û hewalê zivistanê nizanî / Te mala xwe xirab kîr / Mala mi zî ser de danî" (Aldatmaz, 2014:72). Yewna varyantê vistonika ma, Dêrsimî dî esta u uca dî zi lezvate Kurmancî yo. "Him dikim, gim dikim Derî şîkandim Werim te buxim." "Xanga heft biran Xanga heft biran Ser medevo giran, Golik ketine zevîya biran" (Aldatmaz, 2014:185). Ino zi mocneno ki vistonikanê Zazakî ser o tesirê Kurmancî esto. Çimki coğrafyaya Zazayan u Kurmancan yewbinan ra nîzdi ya u diyalektan dî zi seypêti estî.

3.7.1. Lezvateyê Varyantê Çoligî

"-Ez hem ken, gim ken, howt tîzûn ken, howt berûn asinînûn şîknen yen ti pey d' wen, nîyû z' ti mi îr gîştê xwu wa qûel zurbê berî ra kena tever, ez sipen"(Bor, 2013:206).

3.7.2. Lezvateyê Varyantê Dêrsimi

“Yane teqnena,
çêver şiknena,
êna pê çêveri de to maf kena” (Çelker, 2005:90).

Ma cor dî vatbî keynek zewtê xu sey lezvate vona:
“Bırao, bırao tî weş u war bê,
şorê astê marê kori bê.
Astê marê kori şoro linga tora,
linga to ne zer bo, neki der bo.
Derd u khulê tora fam mebo,
dari dermanê to ’be destê mibo.” (Çelker, 2005 :95)

Maro sia marê zere çêneke de kuno qesa:
Marê zeri, marê zeri bê teveri!
Ez nawa wertê gul u sosina dera” (Çelker, 2005: 95).

“Marê zerê çêneke vano:
Marê teveri, marê teveri!
Tî bê ita, ita germo,
ez nawa wertê zerr u pişka dera,
wertê vazdê velıka dera” (Çelker, 2005: 95-96).

“Marê teveri vano:
Têêêwww oca dina tariya,
tî oca caê xode lif dana manena.
ita ez her heti ser şona,
mergizera ra çerena,
dina roştî de kêf kêfê mîno” (Çelker, 2005: 96).

3.7.3. Lezvateyê Varyantê Licê

Ma vat bî ki, ino varyantê ma zaf ciya yo. Pêyniyê vistonik dî qal kerdîşê way u birayan sey yew deyir, yew şîir bî yew zıwano neqışnaye vajiyayo. Lezvateyê varyantê Licê sare ra heta peyni Kurmanci ya. Xura miyanê varyantê Licê dî zi çekuyê Kurmanci zaf esti.

<p>Û vana: ‘Emero ha ‘Emero! Qeyîkê bîne bero, Qeyîkê bîne bero, Bidim te zêrê zero. Ew vano: Zîzanê ha Zîzanê! Bide min ramîsanê, Bide min ramîsanê, Te (bi) bim mala bavanê.</p> <p>A vana: Bi serê bavan û kekan, (Bi)kevim golê girênekan, (Bi)kevim golê girênekan. Tu car nakim van yekan.</p>	<p>Û vana: Derwêşo ha Derwêşo! Qeyîkê bînê pêşo, Qeyîkê bînê pêşo. Bidim te topê qumêşo. Ew vano: Zîzanê ha Zîzanê! Bide min ramîsanê, Bide min ramîsanê. Te bim mala bavanê.</p> <p>A vana: Bi serê bavan û kekan, Kevim golê girênekan, Kevim golê girênekan. Tu car nakim van yekan.</p>	<p>Û vana: ‘Elîyo ha ‘Elîyo! Qeyîkê bînê pîyo, Qeyîkê bînê pîyo. Bidim te zêrê osmalî yo. Ew vano: Zîzanê ha Zîzanê! Bide min ramîsanê, Bide min ramîsanê. Te bim mala bavanê.</p> <p>A vana: Bi serê bavan û kekan, Kevim golê girênekan, Kevim golê girênekan. Tu car nakim van yekan</p>
--	---	---

Tablo-3: Lezvateyê Varyantê Licê

“Û vana gurr û xo erzena mîyanê aw.....Heta ê resenê ci, a xeneqêna. Way xo anê teber, vanê “hela ma biqeleşnin”. Gava qeleşnenê, hanene mar tede wo. Marî kişenê” (Licokic, 2007: 84-86). La çî feyde, hin waya yin merda. Eglebi peyniyê vîstonikan; bî kıştîşê karaktero xırab u bî keyfweşiyê karakteranê holan qediyeno. La no varyantê Licê xırab qediyeno u goşdaran qehirneno.

3.8. Cumleya Peyniya Varyantan (Formelê Peyni)

Vîstonikan dî hisiyati muşterek esti, yani sey holi u xırabî, rındî u pîsî, heq u neheqî, bext u bêbextî esti. La peynî dî zafî rey holi u edalet muwafeq benî. Karakterî hol u raşt, bî mîradê xu şa benî, kesî xırab u neheq zî cezayê xu vînenî. Peyniya her vîstonik dî dersgîrotîş u îbretgîrotîş esto. Sayeyê vîstonikan dî mezgê insanan dî holi u exlaq ca geno.

Peyniya vîstonikan dî formelî qedinayîş esti u vîstonik pê mîni vateyan qediyenî. Rawrê peyniya vîstonikan bî neqarat qediyena. “Mî ra zur, humay ra raşt / Mî yo taway helaw viraşt / Mî cemaat ra kerdi raşt” (Kurîj, 2014:60) “Îne enrê xo werdo, Xızîro Khal mîrad çîmanê kesî de meverdo” (Çelker, 2005:315)

Varyantê Çolig bî na cumle qediyena. “Mî ra zur, Hûmay ra raşt. Mî ûja d’ ca verda ez ûmeya” (Bor, 2013:211). Varyantê Dêrsım bî na cumle qediyena. “Şa-nike qediye, şiyê xorê, rame be ma u piê torê” (Çelker, 2005:98). Varyantê Licê u Sêwregî dî cumleya peynî çin a.

NETİCE

Miyanê tewiranê edebiyato feki dı, tewiro ki tor zaf yeno zanayış vistonik i. Miyanê şari dı eyne vistonik, bı eyne tema la bı ferqanê çıckekan vajiyena. Xura imkan çin o ki, eyne merdım eyne vistonik dı rey seypê vajo. Her kiye dı, her dew dı, her mıntıqa dı yew varyantê eyne vistonik vejyeno verê ma. Ino çı yew xususiyetê edebiyatê fekki yo u ziyedbiyayışê varyantan zi ino semed ra yo.

Zazayan tarixê xu dı; çiyê ki diyo, çiyê ki kerdo, fek ra fek kırışnayo u hetanê nê serranê ma ardo. Ma veyneni ki; folklorê Zazayan benuştış zi hetanê ewro pê vatiş neql biyo u ameyo. Zıwan sey yew pird o u mabenê vizêr u ewroyê şari xu dı vındeno. La çı heyfo ki no edebiyato fekki weş u delal zaf nêameyo nuştış. Seke yeno zonayış, çiyê ki nusiya meştê rê maneno la derheqê folklorê Zazayan dı çımeyê nuşteki tay i.

Ma peyni dı eşkeni ina vaji; vistonik virê cemaati ya u rengê ê cemaati nawnena merdımı. Vistoniki her mıntıqayı xususiyetê ê cayan muhefeze kenı. Her mıntıqa, vistonikanê xu bı rengê zıwanê mıntıqayê xu neqışneno. Miyanê nê vistonikan ra ma xu rê Waya Hewt Birayan vıjna, derheqê na vistonik dı yew melumato kılma da u çahar varyanti na vistoniki muqayese kerdi. Ma destpêkê çahar varyanti na vistoniki, karakteri yin, lezvatayi yin, ciyayi u muşterekîyê yin nayi têver a.

Kıtabi Ki Vistonika “Waya Hewt Birayan” Tede Neşır Biya

1. ADABEYİ, Feyza, “Waya Hewt Birayan”, Mıntıqa: Sêwregi, *Estanikanê Sêwregi Ra*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 81-84.

2. ALDATMAZ, Nadire Güntaş, “Wayê Ve Hot Birawû ra”, Mıntıqa: Dêrsım, *Sanıkanê Mamekiye Ra*, Weşanê Enstituya Zıwananê ke Tırkiya de Cıwıyenê ya Ünıversîteya Artuklu, Mardin, 2013, r. 15-18.

3. AYDIN, Suphi, “Keyneka Wayêr Hot Birayon”, Mıntıqa: Dep, *Henarek: Kitab Sonikon*, Weşanên Apecê, Swêd, 2013, r. 21-29.

4. BOR, İsmet, “Yo Way û Howt Birayî”, Mıntıqa: Çolig, *Vistonikê Dadîyê Mi*, Weşanxaneyê Roşna, Dîyarbekir, 2013, r. 201-211.

5. ÇELKER, Xal, “Hera Weline”, Mıntıqa: Dêrsım, Gımgım, *Welat Ra Şanikê Şanî*, Vejıyayışê Tiji, Estemol, 2005, r. 83-98.

6. ÇİÇEK, Ali Aydın, “Dêva Howt Sareye”, Mıntıqa: Tekman, *Sayê Marû: Estanikanê Xinis û Tekmanî Ra*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2012, r. 33-47.

7. HAYIG, Rosan, “Heso Çi’harçım (Musiko ‘Etar)”, Mıntıqa: Dêrsım, *Mahmeşa-Vizêr ra Ewro İstanikê Zazayan*, Vêjıyayışê Tiji, İstanbul, 2007, r. 15-20.

8. KURİJ, Seyîtxan, “Wayê Hot Birayûn“, Mıntıqa: Çolig, *Wayê Hot Birayûn: Sanikan û Deyîranê Çewlîgî*, Arya, İstanbul, 2002, 39-47.

9. LICOKIC, Mihanî, “Herra Herrîne”, Mıntıqa: Licê, *Sanikan û Deyîranê Licê Ra*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2007, r. 73-86.

10. MALMÎSANIJ, Mehmet, ”Pîra Hewtsera”, Mıntıqa: Piran, *Folklorê Ma ra Çend Numûney*, Weşanên Jîna Nû, 2000, r. 201-206.

11. SATICI, Çetin, “Howt Biray û Ju Waye”, Mıntıqa: Gimgim, *Şalîl û Bilbil*, Mezopotamîen-Verlag, Köln, 2007, r. 116-118.

12. ERDEM, Turan-ERDEM, Orhan, “Way û Hewt Bray”, Mıntıqa: Sankuş, *Kürtçe Dil Dersleri-Zazaca Hikayeler (Dersên Zuwenê Kurdî-Zazakî û Sonikî)*, Weşanxaneyê Arya, İstanbul, 2012, r. 222-229.

Kovari Ki Vistonika “Waye Hewt Birayan” Tede Neşir Biya

13. APUHAN, Dalyan, “Wayê Hot Biron”, Mıntıqa: Çolig, Vir, Humar:1, Payiz 2016, İstanbul, r. 7-13.

14. HILHECIKÎ, Memê, “Weyki W Huwt Birî”, Mıntıqa: Aksaray, Bîrnebûn: Kovara Hunerî, Çandî û Lêkolînî ya Kurdên Anatoliya Navîn, Hejmar:7, Spanga, Bihar 1999, r. 87-90.

15. KAYMAK, O. Wedat, “Waye Howt Birayan”, Mıntıqa: Piran, Armanç, Hejmar:130, Tebax 1992, Bromma, r. 10.

16. KIRKAN, Ehmed, “Waye Hewt Birayan”, Mıntıqa: Sêwregi, *Veyvêka Darêne: Kovara Domanan a Hîrêaşmîye*, Hûmare:1, İstanbul, Wisar 2013, r. 10-13.

ÇIMEYÎ

ADABEYÎ, Feyza, *Estanekanê Sêwregi Ra*, Vate, İstanbul, 2005.

ALDATMAZ, Nadire Güntaş, *Folklorê Kîrmancan Ser O*, Roşna, Diyarbakır, 2014.

AYDIN, Mustafa, Roja Welat, “Koremore”, Hejmar: 4, Ankara, 1978, r.12.

BOR, İsmet, *Vistonikê Dadîye Mi*, Roşna, Diyarbakır, 2013

CAN, Mutlu, *Bîbliyografyaya Sanikanê Kurdkiya Kirmanckî (Zazakî) I-II*, Kovara Vate, Humar: 46-47, İstanbul, 2015-2016.

ÇAĞLAYAN, Ercan, *Zazalar Tarih, Kültür ve Kimlik*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2016.

- ÇIÇEK, Murat, *Estanikanê Gimgimî Ra: Mêşa Dengize*, Vate, İstanbul, 2014.
- ÇELKER, Xal, *Welat Ra Şanikê Şani*, Vejiyaişê Tiji, Estemol, 2005.
- ÇEM, Munzur, *Luye Be Biza Kole Ra*, Weşanên Komkar, Köln, 1998.
- ESPAR, J, Îhsan, *Tanî Estanikî û Deyîrê Ma*, Weşanên Rewşen, Almanya, 1995.
- GEDİK, Akman, *Gim gim Zereyê Ma De*, Vate, İstanbul, 2004.
- KURİJ, Seyîtxan, *Wayê Hot Birayûn: Sanikan û Deyîranê Çewlîgî*, Arya, İstanbul, 2002.
- _____, *Arwûn û Lûy: Sonikî Çoligî*, Çapa Dîyin, Nûbihar, İstanbul, 2014.
- _____, “Xebatê Peter J.A. Lerch Derheqî Kurdoloji De”, *Nûbihar Akademî Dergîsî*, Cild: 1, Humer:1, İstanbul, 2014, r.93-108.
- YILDIRIM, Kadri, BİNGÖL, İbrahim, LEZGİN, Roşan, *Edebiyatê Kirmanckî ra Nimûneyî*, Weşanê Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya Ciwîyenê ya Unîversîteya Artuklu ya Mêrdînî, Mardin, 2014.
- LICOKIC, Mîhanî, *Sanikan û Deyîranê Licê Ra*, Vate, İstanbul, 2007.
- MALMÎSANÎJ, Mehmet, *Folklorê Ma ra Çend Numûney*, Weşanên Jîna Nû, Balinge/Sweden, 1991.
- MÎRVANÎ, Sîyamend, *Kal Mûsenî Zeydûnû: Folklorê Mîyaran Ra*, Vate, İstanbul, 2012.
- VERROJ, Seîd, *Folklorê Kurdî; Kurmancî û Dîmîli*, İstanbul, 1995.
- YILMAZ, Maruf, TEMÎ, Ahmey, *Fistonik*, Jîndanî, Stockholm/Sweden, 1988.
- MALMÎSANÎJ, “Xal û Wariza”, *Tirej*, Humer:2, r.60-62, İzmir, 1980.
- _____, “Pîra Hewt Sera”, *Tirej*, Hejmar:3, r.72-79, İzmir, 1980.
- _____, “Tayê Nuşteyî Peter Lerch”, *Hêvî-Kovara Çandîya Giştî*, Humer: 5-6, Serr: 1986-1987, Paris.



ZAZA¹

Ludwig PAUL²

Çeviren: Murat ALANOĞLU³

Zaza, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Kürtçe konuşulan bölgenin kuzeyinde, İranî dillerden Zazaca konuşanları tanımlamak için kullanılan tabirdir. Zazaların yayılma alanı Siverek, Erzincan ve Varto arasındaki üçgendir. Nüfusları hakkında elimizde güvenilir bir istatistik olmamakla birlikte, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da 1.5 ila 2 milyon⁴ arasında Zaza'nın yaşadığı tahmin edilebilir. Son kırk yılda yaklaşık aynı miktarda Zaza da Türkiye'nin batısındaki büyük şehirlere ve Batı Avrupa ülkelerine göç etmiştir. Bu sayı tüm etnik Zazaları kapsar, ancak bunların çoğu aynı zamanda Türkçe ve Kürtçe tarafından asimile edilmiştir. Nitekim Zazaların önemli bir kısmı artık anadilini aktif şekilde kullanamamaktadır.

Halk: Dini inanışta bütün Zazalar Müslümandır. Fakat yaşadıkları bölgeler kuzey ve güney grubu olmak üzere ikiye bölünmüştür (İki kısım da yaklaşık olarak aynı büyüklüktedir). Kuzeydeki birinci kısım Alevi (Şii) mezhebinden iken, güneyde yer alan ikinci kısım ise Sünni mezhebindedir (Çoğunlukla Şafii). Sünni Zazalar dini bakımdan daha ziyade güney kısımda komşu oldukları Sünni Kürtlerle yakın bağlara sahiptirler. Bu yüzden tüm Zazaların bir arada olup olmadığı veya Zazacanın ayrı bir dil olup olmadığı sorusu ortaya çıkar.

1 Bu çalışma "Zaza" başlığıyla The Encyclopaedia of Islam, New Edition, Volume XI, Brill: Leiden 2002, ss. 491-492'de ansiklopedi maddesi olarak yayımlanmıştır. Yazarın onayı ile Türkçeye çevrilmiştir.

2 Prof. Dr., Hamburg Üniversitesi/Almanya.

3 Dr., Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi Tarih Bölümü,
muratalanoglu@gmail.com

4 Bu yazının 2002 yılında yayınlandığı düşünülürse günümüzde bu rakamın daha yüksek olduğu söylenebilir. Zira günümüzde 3 ila 3.5 milyon arasında Zaza nüfusunun mevcut olduğu tahmin edilmektedir. (ç. n.)

Zazalar ve dilleri hakkında 1980'lere kadar çok az şey bilindiğinden, sürekli onların Kürt oldukları ve dillerinin de Kürtçenin bir diyalekti olduğu şeklinde bir genel kabul vardı. Ancak son zamanlarda Avrupa diasporasında başlayan Zazalar ve Zazaca üzerine çalışmaların artması neticesinde birçok Zaza; dilinin, kültürünün ve farklı kimliğinin bilincine vardı. Fakat bugün çoğu Zaza, hala Kürtler ile politik ve kültürel bağlarda ortak olduğunu düşünmekte ve Zazaların bağımsız bir etnik kimliğe sahip olduğunda ısrar etmemektedir.

Zaza adının, esasen dışardan verilen tahkir edici bir isimlendirme olduğu görülmektedir. Muhtemelen anlaşılamayan bir konuşmadan ortaya çıkmıştır (İngilizcedeki "bla bla" gibi)⁵. Zazaların çoğu kendini bu şekilde tanımlamamasına rağmen (Çoğu Sünni Zaza, kendi dillerine Dimili, bazı Alevi Zazalar dillerine Kırmancki ya da basitçe "zônê mâ: bizim dilimiz" derler), Zaza adı günümüzde artık en yaygın kabulü görmüştür. Dımlı/Dımlı adı, Zazaların coğrafi kökenlerini anlama noktasında, eğer bu isim Hazar Denizi'nin güneyindeki Deylem'in tarihi bölgesi ile bağlantılı ise, yardımcı olabilir. (Zazaların erken tarihine dair başka kaynak yoktur.)

Dil: Kuzey-batı İran dili olan Zazaca, 19. yüzyıl ortasına kadar yazılıp çalışılmamıştır. Diğer Kuzeybatı İran dili olan Gûranî (Güney Kürdistan'da konuşulur) ve İran'ın Azeri (Harzendi gibi) dilleri ile çok yakın bağlara sahiptir. Zazaca, uzun zamandır yakın komşusu olan Kurmanci Kürtçesinden önemli ölçüde etkilenmesine rağmen (özellikle kelime dağarcığı, anlatım ve sözdiziminde), genetik olarak Kürtçe ile o kadar da yakın bir akrabalık bağı da yoktur (Gûranî ve Azerî ile karşılaştırıldığında). Zazaca ses değişimlerinin çoğunu Kuzeybatı İranî dillerden almıştır. Örneğin Hint-Avrupa (Indo-European) *K/*g' > Zaz. s/z, *g(u)(h)pal > -J-, *tr > (hi)r, *d(h)w > b, *rd/*rz > f/rz, *sw > w (Örnek: Zazaca: *zan-cini, hire, ber, seri, wen-* "bilmek, kadın, uç, kapı, yıl, yemek"; Kürtçe sadece bu seslerin ilk ikisini almıştır. *Karşılaştırınız: Zan-, zin*, fakat Kürtçenin yer aldığı Güneybatı dilleri şöyle gelişim gösterir: *sê, der, sal, xo*).

Zazacada, isim morfolojisi (biçimbilimi) iki hal ekli (doğrudan ve belirsiz), iki sayılı (tekil ve çoğul) ve iki gramatik cinsiyetli (eril ve dişil) bir sisteme dayanır. Bunun yanı sıra, belirlilik ve canlılık durumunu arasındaki dilbilgisel ayırım yapar. Bazı lehçelerde, Hint-Avrupa -ter- eki kökenli -(e)r sonек dişil belirsiz soneki olarak yaygınlaşmıştır. Niteleme sıfatları ve tamlayan durumunda bir (baş) ismi niteleyen isimler, bu dişil ekinden hemen sonra gelir ve bu eke

5 Buradaki ifade daha önce başka yazarlar tarafından da ileri sürülmüş olmakla birlikte ilmi bir delile dayanmamaktadır. Zaza adının anlamına dair geniş bir açıklama için bkz. Murat Alanoğlu, "Zazalar", *TDV İslam Ansiklopedisi* (DİA), c. EK 2, İstanbul 2016, s. 696-698.

taamlama denilen artbiçimce ögesi (enclitic particle) ile bağlıdır. Kendisinden önce gelebilen çekim ekleriyle birlikte, -d- ögesinin (açık bir şekilde Kuzeybatı Sami dillerinden ödünç alınan) önemli bir belirsiz eki olduğu (örneğin; lazê mı “benim oğlum”, fakat lazde mı [-e/a, -nın/nin, vs. “benim oğlum”]) taamlama dört hal durumlu bir sistem oluşturur. Zazaca fiiller üç şahıs ve iki sayıyı ayırt edecek bir sisteme dayanır ve bildirme kipinin 2. ve 3. tekil şahıslarında dilbilgisel cinsiyet (eril ve dişil) ayrımı yapar. Fiil sistemi şu zamanları içerir; şimdiki (present) zaman (Farsça ve Kürtçede kullanılan önekinin aksine -(e)n soneki ile yapılır), çözümlenmeli gelecek zaman (analytic future), geçmiş zaman (preterite), bitmemişlik/şimdiki zamanın hikâyesi (imperfect), bitmişlik (perfect) I/II ve miş-li geçmiş zaman (pluperfect). Şimdiki zaman, şimdiki zaman fiil gövdesiyle ve diğer bütün geçmiş zamanlar da geçmiş zaman fiil gövdesiyle yapılır. Şimdiki zaman istek kipi (present subjunctive) ise istek gövdesi olan 3. biçim fiil gövdesiyle yapılır (ki bu ekten -(i)y- edilgen soneki de türetilebilir). Sözdizimsel olarak Zazaca, Özne-Nesne-Yüklem sözdizimine sahip bir dildir ve bunu sadece eylem öbeği sisteminde gösterir. Ad öbeklerinde ise, niteleyen her zaman baş ögeyi takip eder; ard ilgeçlerin (postposition) çoğunlukta olduğu fakat aynı zamanda ön ilgeçlerin (preposition) ve ikili ilgeçlerin (circumposition) olduğu karmaşık bir edat sistemi vardır.

BİBLİYOGRAFYA

- O. Mann, *Mundarten der Zaza, hauptsächlich aus Siwerek und Kor. (Kurdisch-Persische Forschungen, Abt. III, Ed. IV)*, ed. K. Hadank, Berlin 1932.
- T.L. Todd, *A Grammar of Dimili (also known as Zaza)*, Ann Arbor (UMI) 1985.
- Malmisanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük/Ferhenge Dımalki-Tırki*, Uppsala 1987.
- P.A. Andrews, *Ethnic groups in the Republic of Turkey*, Wiesbaden 1989, index.
- L. Paul, *Zazaki. Grammatik und Versuch einer Dialektologie*, Wiesbaden 1998;
- _____, *Zazaki-Dialekt, Sprache, Nation?* in B. Kohler (ed.), *Religion und Wahrheit. Religionsgeschichtliche Studien. Festschrift für Gernot Wiefner zum 65. Geburtstag*, Wiesbaden 1998, ss. 385-399.
- _____, *The position of Zazaki among West Iranian Languages*, in N. Sims-Williams (ed.), *Procs. of the 3rd European Conference of Iranian Studies (held in Cambridge, 11th to 15th September 1995). Part I, Old and Middle Iranian Studies*, Wiesbaden 1998, ss. 163-176.
- Zülfi Selcan, *Grammatik der Zaza-Sprache, Nord-Dialekt*, Berlin 1998.

ORTAK ATASÖZLERİNİN HİKÂYELERİ:
FARSİ-KURMANCİ-ZAZAKİ -4-
Hasan ÇİFTÇİ

‘EQİDEYÊN MENZÛM DI EDEBİYATA KURDÎ DE
Nusrettin BOLELLÎ-Nurettin ERTEKİN

ŞİİRİ MULEMMA Ê ŞAİRANÊ EDEBİYATÊ ZAZAKİ
Murat VAROL

ZAZACA VE KURMANCCA İSİMLERDE ÇOĞULLUK
Mehmet ASLANOĞULLARI

MOLLA MUHAMMED KAVARÎ DÎVÂNÎ’NDA AHİRET TASAVVURU
Ahmet GİDER

VARYANTANÊ VİSTONİKA WAYA HEWT BIRAYAN SER O YEW
MUQAYESE
Pervin SEPTİOĞLU

ZAZA
Ludwig PAUL (Çev. Murat ALANOĞLU)